SERETAYÎ

# ZIMANÊ KURDÎ

# 5

*Ev pirtûk ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeyê ya KCK'ê û Qumîteya Zanist û Ronakbiriyê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.*

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

## Qomisyona Ziman ya berê pirtûk amade kirîn

M. Elî DEMİR, M. Şîrîn ÇETİN, Mazlûm TEKİN, Îsmet YALVAÇ, Hewar GUNGEN, Sedîq BENEK, Selamet ERDOGAN, Emîne BULUT, Hesin DEMİR, Sofî SİDAR, Mihemed KARA

**Ji aliyê Qomîteya Ziman û Perwerdeya KCK'ê ve qomîsyonek taybet ji nûnerên parçeyên Kurdistanê, ji bo nûkirin û sererastkirina van pirtûkan hatiye damezrandin.**

## Qomîsyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan

Mizgîn EGÎD, Arşek Baravî, Mazlum TEKİN, M. Şîrîn ÇETİN, Birahîm Xelîl, Laleş Ferqînî, Dijwar BOTAN, Ednan HESEN, Mustafa OSMAN, Hisên CIZÎRÎ

## Redaksiyon

***Qomisyona nûkirin û sererastkirina pirtûkan***
bi alîkariya Bahoz BARAN

## Wênexêziya hinek wêneyan

Muazzez FİLİZ
Cengiz KARA

## Mîzanpaj, rûpelsazî, sererastkirin û berhevkirina wêneyan


Bedredîn OY
Merwan YAMAN

*Çapa pêşîn: 1999*
*Çapa Nû: 2013*

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve, weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**





*"Zimanê me bingehê netewa me pêktîne, divê em biparêzin û pêş bêxin."*

# NAVEROK

**WELATÊ MIN** ........ **10**
**EHMEDÊ XANÎ Û ZIMANÊ KURDÎ** ........ **12**
**CIVÎNA KULÎLKAN** ........ **15**
**HEZKIRINA PIRTÛKAN** ........ **19**
**PAQIJÎ** ........ **21**
**HÊJ DEYNAKIN** ........ **24**
**LEHENGÊ SÊPIYÊ** ........ **27**
**WELATO** ........ **30**
**RONAHIYA HEYVÊ** ........ **31**
**MELAYÊ CIZÎRÎ** ........ **35**
**KESAYET Û TAYBETMENDIYÊN RÊBER APO** ........ **37**
**AGIRÊ SERHILDANÊ** ........ **40**
MIJARA SERBEST ........ 43
**ROJÊ MINDALANÎ CÎHAN** ........ **43**
*TEST 1* ........ *45*
**RÊBER APO** ........ **48**
**BIRCA BELEK** ........ **51**
**KURÊ TOLHILDAN** ........ **56**
**SEDEY ZANIST** ........ **59**
**KOŞKAR** ........ **62**
**BÎRANÎN** ........ **65**
**NAME** ........ **69**
MIJARA SERBEST ........ 72
**WELATÊ ME** ........ **72**
**ZAR BÛMA** ........ **76**
**BANGA AŞTIYA GERDÛNÎ** ........ **79**
**DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINÊ** ........ **82**
*TEST 2* ........ *84*
**AŞÛT** ........ **87**
MIJARA SERBEST ........ 90
**KURDISTAN KA** ........ **90**

BERXWEDANA 14'Ê TÎRMEHÊ ........ 91
BIWÊJ ........ 95
PEYMANAME ........ 97
MIROVÊ CÎHAN RONÎKIRÎ ........ 100
MIJARA SERBEST ........ 102
HÊZA ROJÊ ........ 102
APOLLO LI SER HEYVÊ DANÎ ........ 106
SIBE CEJN E ........ 109
27 XEWNA HIŞARIYÊ ........ 111
RÊHEVAL MAZLÛM DOXAN ........ 114
MIJARA SERBEST ........ 116
HEY PALE ........ 116
KURDISTAN ........ 118
DAXWAZNAME ........ 120
NEWROZ ........ 121
*TEST 3 ........ 123*
TOMIKÊ ÇÛKÊ ........ 126
GEŞTA ÇIYAYÎ ........ 130
BÎRHAT Û DILJÎN ........ 131
ŞEHÎD ........ 136
DARA ÇINARÊ ........ 139
QERO ........ 143
PIRTÛK ........ 148
DAYÎK ........ 150
BÎRANÎNA ŞEHÎD ........ 153
HIŞT HIŞT ........ 157
MIJARA SERBEST ........ 160
XWEZAYA WELATÊ ME ........ 160
*TEST4 ........ 161*

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1**-Kurdistan welatekî çawa ye?
**2**-Li ser nexşê, cihê welatê xwe bibînin?
**3**-Helbestê carekê bê deng bixwînin, bixebitin ku hûn wateya wê fêr bibin.
**4**-Helbestê carekê ji mamosteyê xwe guhdarî bikin. Ji bo hûn temaşe bikin ka mamosteyê we dengê xwe li kû derê bilind, li kû derê nizim dike.









# WELATÊ MIN

Welatê min Kurdistan
Çîmen û mêrg û bostan

Newal û deşt û banî
Xemilîne bi ciwanî


Dengê şalûl û bilbil
Li ser çiya mil bi mil

Tîne awazeke xweş
Dilê mirov dike geş

Lê çi bikim bindestî
Tê de nîne serbestî

Didim peymaneke rastî
Rizgar bikim ji bindestî

***Cegerxwîn***





**WATEYA PEYVAN**

**Bostan:** Cihê bêzûr tê de tê çandin.
**Newal:** Dol, gelî.
**Awaz:** Deng.

## Wateyên Peyvan

**Bostan:** Cihê bêzûr tê de tê çandin.
**Newal:** Dol, gelî
**Awaz:** Awayê Deng

## Em Têbigihin

**1** - Cihê ku helbestvan ewqas pesnê wê dide kûder e?
**2** - Li hember bindestiya welat, helbestvan çi peymanê dide?

## Destûrên Ziman

**1** – Nivîs dibin dû beş:
**a-Hûnandî**
**b-Pexşan**
***a-Hûnandî:* *Ew nivîsên bi rêzik, malik û pîvanan tên nivîsandin hûnandî ne.***
***b- Pexşan: Ew nivîsên ji hevok, bendan pêk tên û pîvana wan li ber çav nayên girtin, jê re pexşan tê gotin.***
**2** - Her rêzikeke helbestê bi tîpên çawa hatine destpêkirin?
**3** - Di helbestê de navên taybet derbas dibin?
Ew navên ku ji bo nasandina hebûnek bi tenê tên bikaranîn, bi tîpên çawa hatine destpêkirin.

## HÎNDARÎ

**1** - Cihê ku hûn lê dijîn, aliyê ku hûn jê hez dikin û pê ve hatine girêdan, di refê de ji hevalên xwe re bêjin.
**2** - Tiştên we ji hevalên xwe re got, bi çend rêzikan bihûnin.
Ji bo hûn hest û hizirînên xwe baş bidin têgihandin, çima pêwîst e, hûn pir peyvan bizanin? Bêjin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Girîngiya Ehmedê Xanî di zimanê Kurdî de çi ye?
2-Gelên zimanê wan winda dibin, çi ji wan tên?



## EHMEDÊ XANÎ Û ZIMANÊ KURDÎ



Ehmedê Xanî kesayetiyeke rewşenbîrê gelê Kurd e. Ji ber vê çendê bi ziman û dîroka gelê Kurd ve xerîk dibû. Ji ber ku di dîrokê de gelên ku zimanê wan winda bûne, ew bixwe jî winda bûne.
Mînak**:** Sumerî û Babilî…
Dîrokê, li gor tiştên derbasbûyî, dahatû xweş nedida diyarkirin. Ji bo sererastkirina dahatûyê li ser dema borî lêkolîn dikir. Ziman jî, bi paş guhê xwe re nedavêt. Dema gelek zimanê xwe pêşbixe, wateya pêşxistina dahatûya wî gelî ye.

Dîroka gel û ziman dû lingên bingehîn ên gelan li ser piyan digirin. Zimanê Kurdî pir dewlemend e. Ehmedê Xanî li ser vî zimanî lêkolîn kir û dît ku bingehê xwe ji dîrokeke kevnar digire. Yên herî zêde ev ziman parastine, Kurdên Zerdeştî ne. Dema em li dîroka gelê Kurd temaşe dikin, dibînin ku gelê Kurd konfedarasyoneke mezin binavê Medan damezrandine.

Dema Ehmedê Xanî li Misrê xwendina xwe diqedîne û dizivire, perîşaniya gelê Kurd dibîne û lêkolîna li ser Zimanê Kurdî berdewam dike. Dibîne ku zimanê Kurdî ber bi tunebûnê ve diçe. Lêkolîna li ser  ziman berdewam kir. Xwest Zimanê Kurdî bibe, zimanekî xwendin û nivîsandinê.
Ji ber ku ziman pergala herî girîng a hevdu têgihiştin û pêşxistina gelan e. Bi vê boneyê Ehmedê Xanî xwest ji zarokan dest pê bike û pirtûka bi navê "Nûbihara Biçûkan" nivîsî…



## Wateyên Peyvan

**Xerîk:** Mijûl
**Dahatû:** Rojên pêş, pêşeroj.
**Zerdeştî:** Kesên bi ola Zerdeşt bawer dikin.
**Zerdeşt:** Filozofê mezin ê Kurda ne.
**Damezrandin:** Avakirin.
**Med:** Ji pêşiyên Kurdan re dibêjin û B.Z.1000 sal li derdora Gola Wanê û çiyayên Zagrosan jiyane.
i

## Em Têbigihin

**1** - Li gor Ehmedê Xanî herdû lingên bingehîn ên netewan li ser piyan digirin kîjan in?
**2** – Li gor nivîsê, em çawa dizanin Zimanê Kurdî di dîrokê de kevnar e?
**3** - Ehmedê Xanî dixwest Zimanê Kurdî xwediyê kîjan taybetmendiyan be?
4-Navê berhemeke Ehmedê Xanî binivîsin.

## Destûrên Ziman

**1** – Peyvên mîna, "**Ehmed, Xanî, Kurd, Zerdeştî**…" yên di mijarê de derbas dibin bi tîpên çawa hatine nivîsandin? Çima?
2-Cudahiya di navbera navê taybet û navê giştî de li gor nivîsana wan çi ye?
**Navên taybet:** Ew peyvên ku ji bo heyîneke bi tenê tên bikaranîn, her dem bi tîpa gir tê destpêkirin.
**Navên giştî:** Ew peyvên ku ji bo gelek heyînên ji heman komê tên bikaranîn û bi tîpên hûr tên nivîsandin.


## HÎNDARÎ

**1** - Ji bo waneya Zimanê Kurdî kaxezek an lênûsekê bigirin.
**2** - Dîtinên Ehmedê Xanî yên li jêr di refê de goftûgo bikin.
***Ji dayîka xwe hez bikin, ji bavê xwe hez bikin û ji hevalên xwe hez bikin; da ku hûn hînî hezkirina dayîka giştî" Kurdistanê" bibin.***
**3**-Sûdê ji pirtûkan bigirin û jînameya Ehmedê Xanî binivîsin.




## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1**-Hûn kulîlkên Kurdistanê nas dikin?
**2**-Zindîkirina kulîlkan  çawa hatiye şîrovekirin?
**3**-Mijarê bê deng bixwînin:
-Dema we bê deng xwend, li gor van xalên jêr tev bigerin.
-Bê ku hûn devê xwe vekin, lêvên xwe bilivînin nivîsînê bixwînin.
-Dema hûn nivîsandinê dixwînin deng dernexînin.
-Li ser rêzikan, tilî û  pênûsa xwe negerînin.
**4** -Mijarê bi awayekî rast, bi wate û bi deng bixwînin.
**5** -Li hevalên xwe yên nivîsandinê dixwînin bi baldarî guhdarî bikin.




## CIVÎNA KULÎLKAN



Her sal tevayî kulîlkên cîhanê li hevdû dicivin; bûyerên ku bi serê wan hatî û dîtine şîrove dikin. Bi vî awayî kulîlka ku çalakiya herî xweş kiriye re xelat dikin.
Îsal cihê civînê li mala Rihanê bû. Roja civînê hatibû diyarkirin. Hemû kulîlk amade bûbûn. Lê kulîlkên **Nêrgiz, Sosin û Beybûn** nehatibûn. Ji ber ku hertim dereng diman û xwe li hêviya wan nedigirtin, dest bi civînê dikirin.
Gulê mafê axaftinê girt û dest bi şîroveya xwe kir**:**
-Îsal tiştekî balkêş min nekiriye, tenê di qada dibistanêkê de min kulîlk vekirin

û dibistan xemiland. Bi hebûna min zarok gelek dilşad bûn.
Şûşanê xwe da pêş û mafê axaftinê girt:



-Ev çend roj in, ez li ber serê nexweşekî bêkes rawestiyabûm. Ji bo ku ez bîranînên wî yên kevin û xweş zindî bigirim, min kar dikir.
Hemû kulîlkan bi hev re got:
-Pir baş e! Bêguman we xelat maf kir.
Siyabû ji dawiya civînê rabû û got:
-Ez ketibûm ser sifra xwarineke fermandar û kesayetên mezin, li dor civiyabûn. Civat li ser mijarên şer, kuştin û hejariyê daxivîn.
Kulîlkan hemûyan bi hev re got:
-Bibire bibire!...
Bi dengekî bilind:
-Bes e bes e!... Kulîlka bêmirad.



Bi vî awayî hemû kulîlkan mafê axaftinê girt, bîranîn û serpêhatiyên xwe şîrove kirin. Dest bi danûstandina ji bo xelatdayînê kirin. Di wê demê de dengekî bilind ji derve hat bihîstin. Derî vebû. Her sê kulîlkên din "**Nêrgiz, Sosin û Beybûn**" di nava xwuhdan û xwînê de, pir westiyayî ketin qadê.
**Nêrgiz:**
Biborînin hevalino; em dereng man. Em ji cihekî dûr, ji welatê rojê, ji serê çiyayên Kurdistanê tên. Di rê de em rastî termê sê ciwanên Kurd (ku ji bo rizgarî û azadiya welatê xwe giyan dayîn) hatin. Me xwe nêzîkî wan kir. Ji bo li hemberî germa havînê pûç nebin; me xwe ji bo wan kir sêwan û sîber, bi sîbera me hatin parastin heya hevalên wan hatin.
Bi gotinê re tevayî kulîlk rabûn ser piyan û bi dilekî xweş çepik lê dan û gotin:
-Bijîn, her bijîn, xelata îsal li we pîroz be!



## Wateyên Peyvan

**Şûşan:** Kulîlkek e li ser goran tê çandin.
**Xelat:** Diyariya di encama serkeftinekê de tê dayîn.
**Sîber:** **sih**
**Giyan:** Merg, rewan, can.
**Sêwan:** **(**Şemsiye) Amûrek e ji bo parastina ji germahî û baranê.

## Em Têbigihin

**1** - Çima ji kulîlka Şûşanê re gotin te xelat maf kiriye?
**2** - Çima Nêrgiz û hevalên xwe dereng mabûn?
**3** - Nêrgizê û hevalên xwe di rê de çi kiribûn?

## Destûrên Ziman

**1** - Li peyva Kurd, paşgira **"stan"** zêde bikin. Peyva Kurdistan a we sazkirî çi wateyê dide? Girêdana wateya peyva Kurd û Kurdistan bi hev ve çi ye?
**Pêvekên sazker bi dû awayan çêdibin:**
**a- Paşgir:** Kurd-**stan** = Kurdistan
Ga-**van = Gavan**
Ser-**dar = Serdar**
**b- Pêşgir: Ber**-bang = Berbang
**Ber**-çav = **Berçav**
**Da**-girt = **Dagirt**
**2** - **"*Lê kulîlka Nêrgiz, Sosin û Beybûn nehatibûn*."** Vê hevokê bi awayekî kite ji hevdû cuda bikin. Di her kiteyekê de çend tîp hene? Em dikarin bibêjin li gor Rêzimana Kurdî jimara kita, bi qasî jimara tîpên dengdêr e?

## HÎNDARÎ

**1**- Hûn jî metelokeke li ser kulîlkan hatiye nivîsandin di refê de bibêjin.
**2** - Lênûsekê ji bo peyvên nayên zanîn bigirin. Peyvên hûn nizanin ji ferhengan fêr bibin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Çima em ji pirtûkan hes dikin?
2-Pirtûka herî zêde hûn jê hes dikin kîjan e?
3-Dostaniya we ya bi pirtûkê re çawa ye?





# HEZKIRINA PIRTÛKAN

Di zarokatiya min de, şahiya min a herî şîrîn, qulibandina pelên pirtûkên biwêne bûn. Her rûpelekî biwêne yê pirtûkê, bi hûrdeyan ez bi xwe ve dihiştim. Ez dikarim bibêjim wê demê, min jiyana biwêne, ji ya rastî watedartir didît. Li gor min dîtina wêneyeke daran ya di pirtûkekê de ji dîtina dara çinarê û dara spîndarê bi watedartir bû.

Dema pirtûkek li pêşiya min vekirîbûya, min ê xwe ji tevayî şehzadeyên çîroka bextewartir bidîta. Reng, sih û xêzikên li hemberê min pir bandor li min dikirin.

Piştî min dest bi xwendinê kir, girêdana min bi pirtûkan re zêdetir çêbû. Niha jî ji bo ez li ser rûpelekê heya êvarê xul bibim, pêwîstî bi wêneyekî nîn e. Eger di pirtûkê de çend rêzên ku mirov bixwîne hebin, ez dikarim wê pirtûkê zû bixwînim û derbas bikim. Hêj ez nebûbûm deh salî min bi sedan pirtûk xwendin û kom kirin. Weke xwendina pirtûkan, dîtina wan jî pir li xweşa min dihat.

Dema min serê xwe ji ser pirtûkê radikir, di serê min de pir xiyal derbas dibûn. Pirtûkên min xwendî, di serê min de zindî dibûn.

Carna peyvekê ez dihizirandim. Carna min hevokeke pir xweş didît û ji ber dikir. Ya herî zêde peyvên min nedizanîn, ji min re girîngtir dihatin. Ez dihizirîm ku ji bo hînî wata wan peyvan bibim, pêwîstiya min bi pirtûkxaneyeke dewlemend heyû. Eger ez nebim xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend, ditirsiyam ku ez hînî wateyên wan peyvan nebim.



## Wateyên Peyvan

**Xul:** Tewandin, çemandin.
**Xiyal:** Çêkirina tiştekî di mejî de.
**Zindî:** Giyandar, candar
**Pirtûkxane:** Cihê pirtûk lê tên komkirin û belavkirin.

## Em Têbigihin

**1** - Çima nivîskar dema zarok bû, bêhtir ji pirtûkên biwêne hez dikir?
**2** - Kengî nivîskar xwe ji şehzadeyê çîrokan, bextewartir didît?
**3** - Piştî nivîskar dest bi xwendinê kir, têkiliya wî bi pirtûkan re çawa pêş ket?
**4** - Nivîskar çima dixwest bibe xwediyê pirtûkxaneyeke dewlemend?
**5** - Di benda destpêkê ya nivîsa we xwendî de, çend hevok hene? Her hevokek çi dide têgihandin?

## Destûrên Ziman

**1** - Dema pêşiya peyva “**wêne**” “**bi**” zêde dibe, çi wateyê distîne? Wata peyvên “**wêne**” û “**biwêne**” li ferhengê binêrin û bêjin.
Di hevoka, **“Her rûpeleke biwêne yê pirtûkê**, **bi hûrdeyan ez bi xwe ve dihiştim.**” de kîjan peyva wê çawabûna rûpelê dide diyarkirin.
**2** – Peyvên, **pirtûkxane** û **dewlemend** di lênûsa xwe de binivîsin. Tîpên dengdêr ên di nav van peyvan de binê wan xêz bikin.
Tîpên dengdêrên **dengdirêj** “**a-ê-î-o-û**” çawa ji devê we derdikevin?
**“Egîdê keçel û Siyabend çûn çiyê.”** Tîpên dengdêrên dengdirêj ên di vê hevokê de, li lênûsa xwe binivîsin.
Tîpên dengdêrên **dengkurt** “**e-i-u**” çawa ji devê we derdikevin?
**3** - Di hevoka “**Ez fêrî xwendinê dibim**.” de tîpên dengdêrên dengkurt diyar bikin?
4-Li dawiya hevokên temambûyî **xal** (**.**) tê bikaranîn.
**Mînak:** Mamoste, dayîk û bav e.
Bêrîvan çû bêriyê.

## HÎNDARÎ

**1** – Mirov ji pirtûkxaneyeke dewlemend çi sûdê digire, bêjin.
**2** - Sojeya mijara we xwendî bêjin.

# PAQIJÎ



Leber pîsî û çepelê tû
Ême torayîn kake Aso
Ta Aso xawên nebêtewe
Nagerêynewe nagerêynewe
Pişû bide …wiryabe
Bo berewey mal li ser xo biro
Çep, rast,çep,rast,çep
Xor xor xor xor were Aso
Heta zuwe  pak xot bişo
Seyrî xot ke çend ciwanî
Delêy gulî baxanî
Aso serit xawêne
Beşane ciwan daybêyne
Dey fermo kaka Aso
Be filçe danit bişo
Zor mandowît kake Aso
Danîşe nanet bixo

Bo kes niye em noyêne
Bo kak Asoyî xawêne

Aso pak û rû xoşe
Wek ême bonî xoşe
Ewey pak û xawên bê
Hemû kes xoşî dewê

## Wateyên Peyvan

**Torayî:** Xeyidî
**Xawên** : Paqij
**Delêy**: Dibêje
**Pişo**: Bêhn(nefes)
**Pak**: Paqij
**Xor:** Zû
**Dey** : Dê-haydê
**Filçe**: Firçe
**Danit:** Didanên te
**Mandoy**:Westayî
**Sirpe sirp:** Wirte wirt,piste pist
**Nextêk:** Kêmek,piçekê
**Peyje:** Pêpilke, pêpik
**Rûyan lê wergêran:** Berê xwe jêvegêra
**Ême torayîn:** Em sil bûn
**Awêne:** Neynik
**Şane:** Şeh (şehê seriyan)
**Xencîlane:** Xweşkok, ciwan


### ÇALAKÎ

Le xaney (a) çend wuşeyek nûsrawe
Le xaney (b) da çend wuşeyek nûsrawe
**Pêçewanekanyan, tû be pênûseket wuşe pêçewanekan be yektir begeyene.**

| A | B |
|---|---|
| Pakijî | Rast |
| Leser | Biçûk |
| Derewe | Jûrewe |
| Çep | Pîsî |
| Gewre | Lexuwar |

## XEBATÊN AMADEKARİYÊ

1-Cegerxwîn li kîjan parçeyê Kurdistanê ji dayîk bûye?
2- Helbesteke Cegerxwîn ji ber bikin.



# HÊJ DEYNAKIN



Gelê Kurdan ji xew rabin, werin carek temaşe kin!
Yekîtî qenc e, pir baş e li Kurdistanê peyda kin.

Ji xew rabin gelî yaran, werin bigirin wekî baran,
Temaşekin li neyaran, li Kurdistanê meyze kin.

Birayên me di vê dewrê, gelo çawa dikin sebrê?
Li ber vê zilm û vê cewrê, hemî bindestê etrak in.

Gelek mêr in wekî Rûstem, gelek mêr in bi cengê cem,
Gelek dot û kal û cewcem, dikuştin hêj qe deyna kin.

Bi rengê dêwê guhderzî, bikin dinya bibe lerzî!
Hezar rengê Kemal Fewzî şehîd in, wan ji nû rakin.

Bi rengê Sirb û Bilxarî ji vê re xwe medin alî,
Dused wek Xanî û Nalî, Cegerxwîn, Dilbirîn şakin.



***Cegerxwîn***





## Wateyên Peyvan

**Dewr:** Dem
**Cewr:** Zordarî
**Dêw:** Cenawirê di efsaneyan de derbas dibe.
**Etrak:** Gotina ku bi Erebî, Tirkan pê pênase dikin.

## Em Têbigihin

**1** – Pêwîst e, em yekîtiyê li kû derê çêbikin?
**2** - Li gor helbestvan pêwîst e **“Em ji xew rabin**” li kû derê meyze bikin?
**3** - Birayên me di bin destê kê de ne?
**4** - Ji bo hinekî cîhan guhdariya me bike pêwîst e em çi bikin?

## Destûrên Ziman

-Endamên hevoka li jêr hîn bibin.
-Dijmin gelek ciwan kuştin.
**kirek** **pêkir** **kar**
-Di hevoka jor de “Dijmin” **kirek e**, “Gelek ciwan” **pêkir** e,“kuştin” **kar e**. Kesên dikujin dibe kirek, ên kar pê tên kirin pêkir e. Pêkhatina kirinê jî kar e.
**Hevok**: Ji wan birepeyvên bûyerekê, hestekê, daxwazekê û nûçeyekê dide temamkirin re hevok tê gotin.
**Mînak**: Ciwan li Efrînê destanan dinivîsin.
Li gorî sazumaniya hevokê **kar** endamê bingehîn e, bê kar hevokên karî saz nabin.
**Kar**: Ew peyva ku kirinê di hevokê de diyar dike, jê re **kar** tê gotin.
**Kirek :** Peyva di hevokê de kar digire ser xwe.
-Endamên hevokên li jêr diyar bikin.
**-Azad çû.**
**-Bêrîvan hat.**
**-Egîdê Reş vegeriya.**
**-Binevş nameyê dinivîse.**
- Rêzepeyvên di dawiya wê de xal tê danîn, em dikarin bêjin hevok e, çima?

## HÎNDARÎ

**1 -** Bersiva pirsên jêr bi çend hevokan bidin.
- Dema hûn dibêjin helbest çi tê bîra we?
- Parçe xwendina serbest bi we çi dide fêrkirin?
- Dema ji we sazkirina helbestekê bê xwestin, hûn ê kîjan destûran bi kar bînin?

**2-**Dema em nivîsê dixwînin di cihê xal, baneşan û hêmaya pirsê de hêj bêhtir radiwestin. Di cihê bêhnok û xalbêhnokan de jî em hêj kêmtir radiwestin.

**3** - Ji bo hûn helbestê baş têbigihin destpêkê bêdeng, piştre jî bideng bixwînin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Seyîd Riza çima hat bidarvekirin?
2-Ma bidarvekirinê pirsgirêk çareser dibe?

## LEHENGÊ SÊPIYÊ




Seyîd Riza li ber dara sêpiyê rawestiya. Destên wî vekirî ne û li her kêlekeke wî dû leşker hene. Reşik Hûseyin û yên din di rêza darvekirinê de bûn. Fermandarê Tirk Evdila Alpdoğan, dozger, bijîşk, mela û çend berpirsyarên din yên dewletê li wan temaşe dikirin. Kurê Seyîd Riza, Reşik Hûseyin tevî ku birîndar bû jî bi dar ve dikin.

**DOZGER** – (Diqîr e) Seyîd Riza, kurê wî Reşik Hûseyn û hevalên wan ji ber ku li hemberê dewletê serî hildane, raperîn kirine û pêşengiya serhildanê kirine. Xwestine beşek ji xaka komara Tirkiyê veqetînin û Kurdistaneke serbixwe ava bikin, gunehbarê bidarvekirinê hatine dîtin. Niha jî bidarvekirina wan wê pêk bê. Niha ez li gor toreya zagonan mafê gotina wan a dawî didim û ji wan dipirsim: Gotina te ya dawî çi ye?

**SEYÎD RIZA -** (Bi dengekî bilind û bêminet) **:**

Li tû deverên cîhanê talankar û zorkar heya dawî desthilatdar namînin. Sazûmanên xwînmijiyê bi zordestî û bi derewan li ser piyan namînin û temenê wan kin e. (Bi dengekî bilind) Hûn zarên Romiyên bêbext in…

Hûn heya qirikê di nav rezîlî û bêşerefiyê de ne….
Gelê Kurd bi qirkirinê, bi darê zorê, bi bêbextî, bi çewisandinê û bi derewan ji holê ranabe.



Yên ku dibêjin: “Em ê navê Kurd û Kurdistanê ji holê rakin” tucarî ew ê bi ser nekevin.
**Ez bi fen û fotên we xapiyam, ev ji bo min bû derd. Ez jî serê xwe ji we re danayînim bila ev jî ji we re bibe derd.**
Rûreşino! Hûn şerm nakin lê dîrok şahidê bêbextiya we ye. (Bi dest nîşan dide): Ev çiyayên Kurdistanê, wê rojekê rabin ser piyan.



-Ez 75 salî me. Va ez jî dibim şehîd, tev li şehîdên Kurdistanê dibim. Serhildan têk diçe lê Kurd û Kurdistan dijîn û xortên Kurdan tola me dê bistînin...
Bimirin talankar, mêrkuj û zordar!
**Reşik Hûseyin:**
- Bavo! Bila gelê Kurd sax be!
Bijî Kurdistan!
(Seyîd Riza celadê rûreş dehf da û bi destê xwe hilboq xist stûyê xwe lingê xwe li kursî da û tev li nemiran bû.)

## Wateyên Peyvan

**Sêpî:** Sêdarên ji bo daleqandina mirovan tên amadekirin.
**Hilboq**: Xerboq. Ew xerboqa bi benê sêdarê ve ji bona xeniqandinê tê bikaranîn.
**Celad**: Kujer, kesê bi fermana fermandaran mirovan dikuje.
**Zagon**: (Qanûn) destûrên dewletê.
**Fen û Fot:**Fêlbazî, dek û dolab
**Tore**: Adet, kevneşop

## Em Têbigihin

**1**- Çima fermana bidarvekirina Seyîd Riza dan?
**2**-Li gor nivîsê kesên li Seyîd Riza temaşe dikirin kî bûn?
**3**-Dozger ji Seyîd Riza çi pirsî?
**4**-Baweriya Seyîd Riza bi kê dihat ku tola wan hildin?
**5**-Li ber dardekirinê Reşik Hûseyin çi got?

## Destûrên Ziman

1 - Di hevoka "**Xortên Kurd, tola me wê bistînin.**" de endamên vê hevokê diyar bikin?
Peyva **bistînin;** kirina karekî dide diyarkirin, ji ber wê **kar** e.
Birepeyvên **Xortên Kurd;** ji ber ku di hevokê de karekî dike **kirek** e.
**Pêkira** vê hevokê "**tola me**"ye. Ji ber ku bandora karê kirek li ser peyva tol hatiye kirin **pêkir** e.

**2** - Di nivîsa jor de çend nav derbas bûne; van navan li gor sergotarên jêr binivîsin.
Navê mirov...........
Navê welat...........
Navê netew............
Çima ev navên jor navên taybet in?
**3** - Di nivîsê de navên ku ji bo giştî tên bikaranîn vekin, binêrin ka tîpa destpêkê çawa hatiye nivîsandin?

## HÎNDARÎ

**1** - Dema em dibêjin, Seyîd Riza kesekî çawa tê ber çavê we?
**2**-Tîpên mezin ên li jêr bi awayekî rast li lênûsa xwe binivîsin. Heya ku hûn rast binivîsin, nivîsandinê berdewam bikin.

**A - B - C - Ç - D - E - Ê - F - G - H - I - Î - J - K - L - M - N - O - P - Q - R - S - Ş - T - U - Û - V - X - W – Y- Z**

## Welato





Min ji kaniyên te dimêtî, ava jînê ey welat
Lewra dilsoj im ji bo te, min dil û can kir xelat
Ew êzingê tête sotin, ez im bo Newroza te
Ez xunav im tim dibarim, ser pelên lîloza te

Ez bi gorî kim welato, can û mal, pez û kerî
Tev ji bona te erzan e, her dû çav cerg û serî
Sed silavan bi rê dikim ez, bo kanî û lîlava te
Têr nebûm ez qet tucaran, ji ava sûlava te

Ez li zevyên te bibarim, wek reştavên bihara
Av bidim wan gulşenên tî,  mazî, çam, çinara
Min ji te hes kir ji dil û can, pirtir ji ronya çava
Heskirina te welato, da ser a dê û bava.



# RONAHIYA HEYVÊ

Li ser girekî rast heyva çardeşevî derketibû. Tarî gewirbûna rojavabûnê zivirîbû ronahiyeke zelal. Her ku diçû derdor ber bi rojhilat ve sor dibû. Şafir niha hê bêhtir bê dawî dibe. Tevayî xetên li ser xakê razabûn û raste rast xwe dirêj kiribûn, her tişt rast bû. Li ber çavê mirovan ev rastgeh her wekî bê dawî be. Em dû kes bûn, rêya me hêj dûr bû.

Em bêdeng diçûn, çavên me li heyva çarde şevî diket. Heyv weke kulindeke sor û mezin bû. Xalên li ser rûyê wê diyar dibûn. Bi awayekî bi dest bê girtin li ber çavên mirovan dihat dîtin. Li ser şafir ronehiyeke berdewam bû. Her çû heyv bilind bû, ji girê rast xêzik qut bû. Piştî demekê rengeki weke yê zîv girt. Her diçû şînatiya rûyê ezmana gur dibû. Min guhdarî dengê lingê xwe û valahiyê dikir. Kab û masûlkên min westiyabûn. Lê belê firehbûnê bêhna min vedikir. Heyv di esmanê vala de bi rê ve diçû. Min ti tarîtî nedidît. Rastgeh û firehiyê, mirov ditirsandin. Em li derekê rawestiyan û me xwe di kêlaka rê de dirêj kir. Em pir westiyabûn, min serê xwe danî ser xakê û min guhdariya derdorê kir. Xakê herwekî bêhn digirt, min temaşeyî ronahiya heyvê dikir. Tevayê hizirandinên min yên baş û heskirinê di serê zimanê min de dilîst. Li cem min roniya heyvê ya li ser şafir xweşik bû.

Em rabûn û me dest bi rêwîtiya xwe kir. Cîhan mezin, bê dawî û bi wate bû. Heskirina birêveçûnê min di dilê xwe de bi cih kir û diçûn. Dawiya rastgehên bişafir nedihatin zanîn. Di bin ronahiya heyvê de heya dawî em ê biçûna, min ji riya bi tenê û bêdeng hes dikir.



## Wateyên Peyvan

**Şafir:**Navê giyayekî birepin di cihê têrav de şîn dibe.
**Tarîgewrik:** Rengê di navbera spî û reşbûnê de ye.
**Rastgeh:** Ji cihê rast re tê gotin.

## Em Têbigihin

**1** - Dema heyv derketî derdor çawa dihat dîtin?
**2** - Heyv li ezmanan çawa dihat dîtin?
**3** - Nivîskar dema li heyvê dinêre çi dihizire?

## Destûrên Ziman

**1-**Di zimanê Kurdî de peyv li gor çêbûna xwe dibin sê beş.
**a-**Peyvên Xwerû
**b-**Peyvên Dariştî
**c-**Peyvên Hevgirtî (Hevdudanî)
**a-Peyvên xwerû:** Ew peyva ku xwedî wate ye, ti pêvakan nagire jê re dibêjin peyvên **xwerû**.
**Mînak:** Azad- kew- mirov- ax- av- aş- nan.
**b-Peyvên dariştî:** Ew peyvên ku bi pêvekên sazker pêk tên jê re peyvên **dariştî** tê gotin.
**Mînak:**Aşvan- Serî- cotkar.
**c-Peyvên hevgirtî:** Ew peyvên ku ji dû peyvên watedar pêk tên û dibin xwedî wateyeke nû ji wan re peyvên **hevgirtî** tên gotin.
**Minak:** Roj+hilat = Rojhilat
**Der+dor = Derdor**
**Tarî+gewrik = Tarîgewrik**

**2-** Di hevoka “**Derdor ji milê rojhilat ve her diçû sor dibû.**” de peyva “**rojhilat**” a di vê hevokê de derbas dibe. Ev peyv rewşa navê hevgirtî (hevdudanî) dide diyarkirin.

## HÎNDARÎ

**1** - Nivîsa we xwendî ger we nivîsandiba, we yê sergotarek çawa bi kar anîba?
**2-** Rêzikên li jêr bi rengekî xweş binivîsin.

**Keça Kurdistanim**
**Kenarê şax û deştim**
**Rihana bi sirûştim…**
**Zîwer**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Melayê Cizîrî kî ye?
2-Mela ji kîjan devera Kurdistanê ye?





# MELAYÊ CIZÎRÎ

Şox û şengê zuhre rengê
Dil ji min bir dil ji min
Awirên heybet pilingê
Dil ji min bir dil ji min




Wê şepalê miskî xalê
Dêm durê gerden şemalê
Cebheta biskan semalê
Dil ji min bir dil ji min

Zilf û xalan, nûn û dalan
Wan ji min, dil bir bitalan
Goşeyê qewsî, hîlalan
Dil ji min bir, dil ji min



Dêm nedûrê, bû ebîrê
Xemriyo, kîso herîrê
Sîne kir, amancê tîrê
Dil ji min bir, dil ji min

Sur şîrînê, nazenînê
Kuştim û nakit yeqînê
Wê bi çengala, evînê
Dil ji min bir, dil ji min.

***Melayê Cizirî***

## Wateyên Peyvan

**Şox û şeng:** Rind û delal
**Zuhre:** kulîlk
**Heybet:** Tirs û mezinahî
**Xal:** Nîşana rû
**Cebhet:** Enî
**Sema:** Govend
**Zulf**: Bisk
**Nûnû dal:** Dû tîpên erebî ne mebest jê çav, birû, birî û birh in
**Hîlal:** Çarana Heyvê
**Nedûr:** ji min ne dûre.
**Dêm:** Rû
**Herîr:** Ermûş.
**Sîne:** Sing
**Yeqîn:** Bawerî

## Em Têbigihin

**1 -** Hestên helbestvan li hemberî evînê bidin diyarkirin.
**2** –Girîngiya Melayê Cizirî di zimanê me de çi ye?

## Destûrên Ziman

**Malik:** Ew nivîsên hûnandî yên ji çend rêzikan pêk tên jê re **malik** tê gotin. Malikên ji dû rêzikan pêk tên jê re **Cotik** tên gotin.


## XEBATÊN NIVÎSÎNÊ

Tîpên biçûk ên li jêr bi awayekÎ rast li lênûsa xwe binivîsin.
**a - b - c - ç - d - e - ê - f - g - h - i - î - j - k - l - m - n - o - p - q - r - s - ş - t - u - û - v - w - x - y – z**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Jîname çawa tên nivîsandin? Lêkolîn bikin.
2-Jîname çawa ji portrê tê cûda kirin?

# KESAYET Û TAYBETMENDIYÊN RÊBER APO



Zarokek di 4'ê Nisana 1949'an de, li gundê Amara, girêdayî Xelfetiya bajarê Rihayê ji dayîk dibe. Navê Abdullah lê dikin. Navê bavê wî Emer, yê dayîka wî Uveyş e. Ji malbateke asayî bû. Abdulah, di malbatê de bêhtir ji dayîka xwe bandor dibe.

Li welat jî aloziyên mezin dihatin jiyandin, ji ber ku Kurdistan di navbera Ereb, Faris û Tirkan de hatibû parvekirin û dagirkirin. Welatekî bindest, kesayetiyekî bindest. Pêwîstî bi azadiyê hebû, ji bo vê jî pêwistî bi têkoşîn, pêşengî û serokatiyekî hebû.

Abdullah, dest bi dibistanê dike. Di dibistanê de dibe xwendekarek herî jîr. Di

têkiliyên, kar û jiyanê de jî gelek vekirî û serkeftî bû. Rûmeteke mezin dide hevaltî, jin, jiyan, welat, cihan, civak, mirovatî û xwezayê.
Di dema xwendekariya xwe ya dibistana navîn û amadeyî de jî jîr, zîrek û bi rûmet e. Ji aliyê heval û mamosteyên xwe ve gelek dihat hezkirin.
Herwiha bi zanistî, ramyarî, sosyalîzm û şoreşgeriyê re naskirina xwe çêdike. Piştî xwendina xwe, li Amedê bi qasî du salan karmendiyê dike. Di wê demê de hê bêhtir rastiya Kurd û Kurdistanê ji nêzîk ve dibine, dişopîne û nas dike.
Rewş û rêveberiya dewletê napejirîne. Jîna ku dihat jiyandin teng û paşverû dibîne. Paşverûtiyê bi her awayî şermezar dike û li dijî wê derdikeve. Her roj ji nû ve digire dest û xwe nû dike. Tiştên heyî û yên ku dafirand jî bes û têr nabîne. Mezin dihizire, hewl dide, hes dike û tev digere.
Kesayetiyê bi civakê ve, civakê bi kesayetiyê ve, rojê bi dîrokê ve dîrokê bi rojê ve, girê dide û digire dest. Mirov bi xwezayê ve, xwezayê bi mirov ve, van her duyan jî bi heskirin, viyan û evînê ve girê dide. Welat û cîhanê dixe dil û mejiyê xwe, xwe dike xelatek ji bo welat û gel. Xwe dike mizgîniyek ji bo azadiya mirov, mirovatiyê û dest bi têkoşîna xwe ya şoreşgerî dike. Di aliyekî de aloziyên di nav malbat, gund, welat û cîhanê de tên jiyandin û di aliyê din de jî têkoşîn û jiyana têkoşerên dîrokê yên welat û cîhanê ji xwe re bingeh digire.
Ji bo têkoşîneke şoreşgerî tev digere, piştre jî partî, enî û artêşê bi rêxistin dike. Têkoşina xwe dide destpêkirin. Di rêya vê têkoşînê de gelek pêngav tên avêtin û pêşketin tên çêkirin.
Piştî bi fêlbaziyeke (komplo) navnetewî Rêber Apo (Abdullah Ocalan) tê girtin.
Bi projeya xwe ya nû, ya ku li ser bingehê aştî, azadî, biratî û wekheviyê, bi armanca afirandina civakeke demokratîk daye destpêkirin.

## Wateyên Peyvan

**Faris:** qewmekê li Îranê jiyan dike, di dîrokê de bi navê Persan jî hatiye bi navkirin
**Sosyalîzm:** Beşek ji zanistên civakî, wek heviya civakê.
**Fêlbazî:** Komplo, bêbextî.
**Ramyarî:** Siyaset, polîtîka.

## Em Têbigihin

**1** - Rêber Apo kengê û li kûderê ji dayîk bûye?
**2** - Nûbûnên Rêber APO dixwaze di civakê de çêbike çi ne?

## Destûrên Ziman

**1** - Di nivîsê de **kevanok ( )** çima hatiye bikaranîn?
***Ger di nivîsê de dû peyvên ku heman wateyê pêşwazî bikin, yek ji wan peyvan dikeve nav kevanokê ( ).***
**2** - Di nivîsê de pêveka ku dikeve dawiya jimaran bi kîjan hêmayê tê cudakirin?
**Hêma birînê (dabir):** Bi hêma **birinê (')** ew tîp û pêvekên bi jimaran ve hatine zeliqandin tên veqetandin.
**Mînak: Rêber Apo di 4'ê Nîsana 1949'an de ji dayîk bûye**.
**3** - "Abdullah dest bi dibistanê dike." di vê hevokê de kesê dest bi dibistanê dike kî ye?
Di hevokê de em ji kesê kar dike re dibêjin **kirek**.

## HÎNDARÎ

**1** - Pirtûkên di derbarê Rêber APO de bixwînin û tiştên hûn jê hîn dibin, bi hevalên xwe re parve bikin.
**2** - Ji nivîsandina jêr sûd bigirin û bibînin ku Rêber Apo ji ti zoriyan re serê xwe netewandiye.
***"Rewş û rêveberiya dewletê napejirîne. Jîna ku dihat jiyandin teng û paşverû dibîne. Paşverûtiyê bi her awayî şermezar dike û li dijî wê derdikeve. Her roj ji nû ve digire dest û xwe nû dike. Tiştên heyî û yên ku dafirand jî bes û têr nabîne. Mezin dihizire, hewl dide, hes dike û tev digere."***

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Serhildaneke we dîtî, heye?
2-“**Agir bi serhildanê geş dibe**.” li gor we tê çi watayê?

# AGIRÊ SERHILDANÊ



Îsal li Kurdistanê pir xizanî û hejarî hebû. Li aliyekî berf dibarî, li aliyê din jî serhildan bû.
Rêya min ketibû aliyê Colemêrgê, karekî min li wê derê hebû. Dem dema serhildanê bû. Lê hêj bihar nehatibû xaka Colemêrgê. Li ser kevirê sînorê di navbera Colemêrg û Ûrmîyê de komek mirov civiyabûn, min li wan nêrî, ew ên biçek kî ne?

Haa! Wey li minê ew Egîd e, heyloo! Ew jî Bêrîvan û Newal in. Gelo ev xewn e. Ez dilerizîm, laşê min têşiya. Min di pirtûkekê de wêneyên wan dîtibûn. Haa! Min ew nas kirin. Ew ê agir pê dixe Kawayê Hesinkar e û yê din jî Kawayê hemdem Mazlûmê çavreş e.

Hey gidî dinyayê!
Mahsûm hat ser kevirekî hinekî bê deng rawestiya, piştre hêdî hêdî dest bi gotina xwe kir:

- Me ji mirinê jiyan peyda kir. Me bi qêrîna xwe ya bêkesiyê gazî biharê kir. Biharê di bin berfê de stûyê xwe xwar kiribû.

Em hildikişiyan çiyayên welat, hemû şehîd rabûbûn ser piyan û ketibûn civata me. Hemû şehîdên me yên nemir bi kêfxweşî û dilşadî ketibûn nava me, em bi rê ve diçûn û agir li pey me dihat.

Dewsa me hemûyan dibû agir, em bi rê ve diçûn, diketin nav welat, dar û berên welat bi navê doza me diqêriyan. Çiyayê Agirî weke bûkekê kincên spî li xwe kiribû. Cûdî, Bagok, Zagros û hemû çiyayên welat rê didan me û ala têkoşînê bilind dikirin. Mezin dibû roja welat, îro hemû stran û helbestên azadiyê bi agirê Newrozê geş dibin. Me hemûyan bi destê hev girt û govendek mezin digerand.

Li xaka welat têkoşîna gerila bi agirê serhildanê bilind dibû.

Hemû şehîdan bi stran û tilîliyan dora govendê girtin. Govenda me heya Mahabad, Hewlêr, Amed û Qamişloyê dirêj dibû.

Ez di xew re çûbûm. Hişê min hat serê min. Min dît ku hemû pakrawanên me weke kevokan difiriyan û li ezmanê Kurdistanê her yek dibû stêrkek. Min serê xwe rakir û demeke dirêj li stêrkan nêrî û rondik ji çavên min dihatin xwarê.



## Wateyên Peyvan

**Civîn:** Kombûn.
**Pey:** Dûvre, piştre.
**Dews:** Şûnpê, şop

## Em Têbigihin

**1**-Li ser sînor koma mirovan çima civiyabû?
**2**-Kawayê hemdem kî ye?
**3**-Hevalê Mahsûm li wê derê axaftinekî çawa kir?
**4**-Govenda şehîdan heta kûderê dikişiya?

## Destûrên Ziman

**1** - Peyvên “**serhildan**, **çavreş** û **Newroz**” ev nav ji hevgirtina kîjan peyvan çêbûne?
**2** - Di nivîsê de axaftin bi çi hêmayê hatiye nîşandan?
*(-) Xêzika ku dikeve pêşiya hevoka axaftinê, em jê re dibêjin **xêzika axaftinê**.*
**3** - Hevokên ku peyva Mazlûm û Egîd di nav de heyî bibînin, li lênûsa xwe binivîsin.
**4** - Di dawiya hevoka “Mala min bi şewite!” de çima baneşan (**!**) hatiye bikaranîn?
**5** –Di zimanê Kurdî de ji "Ç.K.P.R.T" re tîpên dûdeng tên gotin.Tîpên li jor dengekî nerm, dengekî hişk derdixînin.
**Minak:**

| **Hişk** | **Nerm** |
|---|---|
| Çaya me şîrîn e. | **Çir** =Giyayê zozanan çire. |
| **Kef** = Kefa sabûnê. | Kewê gozel. |
| **Pir** = Gayê me pir in. | Pira Delalê. |
| **Rez** = Rezê tirî. | Rihan navê giyakî ye. |
| Tor= Tora masiyan fireye. | Tûr=Tûrê genim ciwane |

## HÎNDARÎ

Çend hevokan li ser dîroka ‘Têkoşîna Azadiya Kurdistanê’ bibêjin.

MIJARA SERBEST

# ROJÊ MINDALANÎ CÎHAN

Rêkxirawî netewey êkgirtuwekan le salî hezar û nused û pença û duwa de biryarî da rojî yekemî Huzeyranî hemû salêyk bikrêt be rojî Cîhanî bo hemû mindalanî cîhan û mindalanî Kurdîş, beşêkîn lew mindalaney netewekanî sergoyî em zewîye û boyan heye be cejnî xoyanî bizani û ahengî xoşî têda bigêrin. Em mafe serekiyaneş bo mindalanî cîhan çar dirake debê hukumetekanî cîhan boyan dabînbiken û piştguyan nexen.

1-Hemû mindalan le cîhan da mafî eweyan heye xorakiyan bo dabîn bikrêt û be başî perwerde bikrên.

2-Devê da û dermanî dijî nexoşî parastinyan le derd û dabîn bikrêt.


3-Hemû mindalêk debê dergayî xwêndin û fêrkirdînî leb erdem wala bêt.

4-Nabê mindal ta temenî pêgeyştin (baliqbûn) îşî pêbikrê, eger le temenî mêrid mindalş le ber hejarî naçar karbikat, debê îşî sûk û asanî pêbisperdrê.

De rojî (yekem)î Huzeyran da em mafe serekyane bo mindalanî cîhan çar dirawe û be salî hezar û nused û hestaw heftîşda heman rêkxirawî. Netewey êkgirtuwekan mafî ziyetirî bo mindalanî cîhan dabînkird, boy emroke mindalanî cîhan boyan heye be gewretirîn cejnî xoyan dabinên û şanazî pêwebiken û ahengî xoşî bo bigêrin û mindalanî Kurdîş çêtir le encamî şer bo kimya baran û enfalkirdinî xoyan û kes û kayran, tûşî le navçûn û le xêndin dabiran nebin û jiyanêkî asûdeyan bo dabîn bikrêt le Kurdistanêkî azad da.







## Wateyên Peyvan

**Huzeyra:** Hezîran-meha Hezíranê
**Zewî:** Erd
**Boyan:** Ji bo wan
**Çardirake:** Çar hêl
**Dabînkirin:** Pêkanîn
**Xorak:** Xwarin
**Pêbikrê:** Pê bike
**Mêrd :** Mêr
**Sûk:** Sivik
**Kurdîş:** Kurd jî
**Dabiran:** Bêmirad

## TEST 1

**EY REQÎB**
Ey reqîb her maye qewmê Kurd ziman,
Naşikê û danayê topê zeman.

Kes nebê Kurd dimirin, Kurd jîn dibin,
Jîn dibin, qet nakeve ala Kurdan.

Em xortên rengê sor û şoreş in,
Seyr bikin xwîna wî ya rabirdûman.

***Reûf Dildar***

Her sê pirsên destpêkê li gor Ey Reqîb bersiv bidin.
**1**-Di malika yekem a helbestê de helbestvan banî kê dike?
**A.** Gelê Kurd C. Ala Kurdan
**B.** Kurdistan D. Dijber
**2**-Helbestvan di helbestê de gotiye em xortê rengê çi ne?
**A.** Şêr C. Piling
**B**. Egîd D. Sor û şoreş in
**3**-Li gor rêzika helbestê ya destpêkê gelê Kurd, çima ye?
**A.** Hizir C. Ziman
**B**. Aqil D. Kar

**4**-Ji bo em di demeke kurt de mijarekê di pirtûkê de bibînin pêwîst e, em ji çi sûdê bistînin?
**A.** Ji rûpela B. Ji rêzan
**C.** Ji naverokê D. Ji ferhengokê
**5**-Ji peyvên li jêr hatine reşkirin kîjan navê xwerû ye?
**A. Egîd** çû şêr. **C**. Min **pirtûkxane** çêkir.
**B.** Bizina sor **diçêre**. **D**. **Zordaran** welatê me dagirkirin.
**6**-Nivîsandina peyvên li jêr kîjan rast e?
**A.** Dadgeh **B.** Hewpeyvên

**C** Dilkeş. **D**. Avmedî

**7**-Peyvên di hevokên jêr de hatine tarîkirin kîjan nav e?

**A.Ez** dihizirim.

**B.**Demê me di **malê** de derbas dibe.

**C.**Ez ji **wê** pir hez dikim.

**D.** Piştre **hûn** ê bên.

**8**-Di peyva "**Kurdistanê**" de çend tîpên dengdêrên dengkurt hene.

**A.** Dû **B**. Sê **C.** Çar **D.** Pênç

**9**-Di kîjan peyvên, hevokên li jêr hatine tarîkirin de tîpa "k" nerm hatiye bikaranîn?

**A**. **Kurdistan** welatê min e.

**B.** Ew kesê **ker** be deng nabihîze.

**C.** **Kerên** boz ji yên reş bi hêztir in.

**D.** **Karmend** bi hêz in.

**10**-Di kîjan hevoka jêr de peyva hemwateya "bilind" heye?

**A.** Hûn bi xêr hatin. **B**. Ez çûm dibistanê.

**C.**Ev dar gir bûye. **D**. Ava kaniyan cemidî ye.

**11**-Kîjan hevokên li jêr endamên wê rast hatine diyarkirin?

**A.** Zozan zû ji xew rabû.
kar pêkir kirek pêkir

**B.** Bêrîvan hat malê.
kirek kar pêkir

**C.** Şivan şîr vexwar.
kirek pêkir kar


D. Kewê çû bêriyê.
Pêkir kar kirek

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Ji kê re tê gotin Rêber?**
**2-Rêber Apo nas bikin.**



# RÊBER APO



Rêber li hemberî min e,
Li nav daran digere.
Hertim li bîra min e,
Rûyê xweşê dikene.

Çawa dikarim bêjim,
Rêber hatiye girtin.
Xwedî dilek bi êş im,
Cîhan wê bê dagirtin.

Çawa dikarin bigirin,
Rêberê jîr û zana.
Êqîn xwînmij nizanin,
Bi hêza pakrawana.

Ger bixwaze, wê rabin,
Gelê Kurd ê dil keder.
Wê alê bilind rakin,
Bitêkoşin li herder.

## Wateyên Peyvan

**Jîr:** Zîrek, jêhatî.
**Pakrewan:** Şehîd.
**Êqîn**: Bawerî.

## Em Têbigihin

**1** - Helbestvan çima dibêje kes nikare Rêber bigire?
**2** – Helbestvan di malika sêyem de, Rêber çawa dide diyarkirin?

## Destûrên Ziman

**1** - Di helbestê de navên taybet ên ku ji bo mirov û cih tên bikaranîn hene?
Van li gor rêza helbestê di lênûsa xwe de binivîsin.
**2** - Kîjan peyvên di malika yekem û duyem de navên giştî ne, çima?
**3** - Di rêza “**Ger bixwaze wê rabin”** de bêhnok kîjan peyvan ji hev cuda dike?
**4** - Peyvên “pakrewan û Kurd” dema em pêveka“**an**” bi dawiya wan ve bikin çi guhartin çêdibe?
**Mînak:**
Pakrewan ji her kesî bi rûmetir e.
Pakrewan**an** xwîna xwe ji bo azadiyê rijandin.
Kurd berxwedêr in.
Kurd**an** berxwedaneke mezin kir.
Pêveka"**an**" nav kirine pirjimar.

## HÎNDARÎ

**1-** Helbesta jor ji mamosteyê xwe guhdar bikin.
Mamosteyê we helbestê bi çi awayî dixwîne?
**2-** Piştî we helbest baş girt, di refê de bi deng bixwînin.
**3-**Hûn jî helbestekê li ser Rêber APO bêjin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Birca Belek dikeve kûdera Kurdistanê?**
**2-Birca Belek navê xwe ji çi girtiye?**



# BIRCA BELEK

Rojek ji rojên biharê yên xweşik bû. Destpêkê baran barîbû. Piştre jî rojek xweş vebûbû.

Şîlan:

- Rûgeş , were em biçin li Birca Belek bigerin.

-Erê, ev nêrînek pir baş e.

Di cih de kincên xwe wergirtin û ketin rê. Şîlanê hewayê paqij kêşa û peyvî**:**

- Ox! Dema baran dibare, her alî çiqas xweşik dibe.

Rûgeş jî ewqas bextewar dibû.

Rûgeş:

- Rast e. Piştî baranê bêhna axê çiqas xweş e!... Çiqas xweş e ma ne?


Têra xwe bi rê ve çûn, ketin ser rêya ku diçe Birca Belek.

Şîlan**:**

- Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?

Rûgeş:





- Piçekê ez dizanim.
Şîlan**:**
- Birca Belek cihê fermandariya herêma Botanê bû. Qesreke mezin ji hêla mîrê Cizîrê ve, li ser robarê Dîcleyê hatiye avakirin. Dîwarê qesrê rêzek bi kevirên reş, yek jî bi yên spî hatiye çêkirin. Piştî demekê ji aliyê hêzên dagirker ve hatiye dagirkirin, demeke dirêj weke baregeha leşkerî dihat bikaranîn.
Rûgeş**:**
- Rast e, gelek cihên dîrokî yên gelê me hene ku ji aliyê hêzên dagirker ve hatine dagirkirin.
Şîlan**:**
- Weke ku tê binavkirin, em bi riya Şêran ve hêdî hêdî diçin.
Şîlanê Birca Belek baş nas dikir. Beriya niha bi bavê xwe re lê geriyabû. Li hemû cihên wê geriyan.
Şîlan**:**
- Rûgeş, Birca Belek ji sê sed û şêst û şeş odan pêk tê. Hem firehbûna xwe pir fireh e, hem jî bilindbûna xwe  pir bilind e.
Rûgeş:
- Ha Şîlan, nêzîk e ku dibin rêveberiya Rêber APO de Birca Belek ji dagirkeran rizgar bibe. Fermandar û rêveberên me di Birca Belek de wê rûnin û rêveberiya gelê me bikin.



## Wateyên Peyvan

**Birca Belek:** Avahiyek taybet e, li Cizira Botan ber peravên ava Dîcle ye.
**Birc:** Avahiya li ser sûr û kelhan hatî avakirin.
**Belek:** Têkilbûna rengê reş û spî.
**Pak:** Paqij.

## Em Têbigihin

**1**-Şîlan û Rûgeş di rojeke çawa de çûbûn Birca Belek?
**2**-Şîlan û Rûgeş di kîjan rêyê de çûn Birca Belek?
**3**-Di benda dawî de diyaloga çi tê kirin?
**4**-Birca Belek li kûderê Kurdistanê cih digre?

## Destûrên Ziman

**1**-Di mijarê de hevokên dibin bersiva hevokên pirsyarî yên jêr bibînin û di lênûsa xwe de binivîsin.
-Şîlanê hewayek çawa kişand?
-Rojek ji rojên biharê ya çawa bû?
*-Peyvên rewş, awa, reng, heyîn û çawabûna navekî didin diyarkirin re **hevalnav** tên gotin.*
**Minak:** Bizina **reş**
Birca **Belek**
Azadê **dirêj**
**2**-Peyvên "**pak, pir, piştre**" yên di mijarê de derbas bûne, hemwateyên wan bibînin û bi wan re bixwînin.
**3**-Di vê hevokê de peyva "**çi** " hevok xistiye rewşa pirsyarî.
"**Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?**" Ji ber vê çendê em ji vê peyvê re dibêjîn **alava pirsyarî**.
Di Zimanê Kurdî de peyvên pirsyarî ev in**:**
"**çi**, **çawa**, **kîjan**, **kengî**, **çend** û hwd."
**4**-Peyvên di hevoka jêr de li şûna nav hatine bikaranîn bibînin.

**Tu dizanî girîngiya Birca Belek çi ye?**
**Rûgeş jî, bi qasî wê bextiyar bû.**
**Were em biçin Birca Belek temaşe bikin.**
**5**-Di vê nivîsê de tîpên mezin li kû derê hatine bikaranîn.
*Pirsnîşan:Ew hêmaya di dawiya hevok û birepeyvên pirsyarî de tên bikaranîn re* ***Pirsnîşan t****ê gotin. Bi sembola* ***(?)*** *nîşan dike.*

.

## HÎNDARÎ

**1**-Birca Belek ji çend odeyan pêk tê?
**2**-Bûyera bingehîn a mijarê çi ye binivîsin?
**3**-Hûn dizanin Birca Belek ya ku Hoste Hine çêkirî li ser Robarê Dîcleyê ye!
**4**-Birca Belek ji aliyê kîjan Mîrê Botan ve hatiye nûkirin û karanîn? Lêkolîn bikin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Gundî çima gundê xwe berdidin?**
**2-Valakirina gundan çi bandorê li ser gelê Kurd dike?**





# KURÊ TOLHILDAN

Rojekê li herêma Botan, qontara çiyayê Cudî şerek di navbera şervanên azadiyê û dewleta Tirkan de çêbû. Hêjmara şervanên azadiyê deh heya pazdeh kesan bû. Demekî dirêj tî û birçî li hemberê dijmin şer dikirin. Gundek bi navê Spêndarok nêzîkî herêma şer bû.

Mezinê gund, gundî tev li qada gund kom kirin û ji bo gundiyan got:

-Gelî gundiyan, gund berdin! Herkesek kel û pelên xwe rizgar bikin!

Zarokek 12 salî xwe da pêş û ji mezinê gund re got:

-Ezbenî ezbenî, nabe nabe. Ew ên ku li dijî dijmin şer dikin, zarokên vî gelî ne, dema ew şer bikin, rev nabe para me. Ev çend roj in ew tî û birçî şer dikin. Dema dijmin bê, pêwist e, em jî li ber xwe bidin.

Mezinê gund rondik ketin çavan û got:

-Ji ber xwe, ji we re negotine mala Tolhildan. Hemû ardê di gund de bipêjin û ji bo şervanan bibin.



Tijî teliskê nan hat berhevkirin û kurê Tolhildan rakir û berê xwe da eniya şer. Demekê dengekî di dilê wî de got**:** Tûjî nanekî bixwe. Lê kurê Tolhildan bi vî dengî gelek bêzar bû, ji ber ku dengê guleyên şer dihat guhên wî.

Kurê Tolhildan di navberekê de wiha li derdora xwe nêrî, dît ku dû heval li pey dû hêstiran ber bi qada şer ve diçin. Di demek kin de herdû hevalan xwe gihandin rê. Kurê Tolhildan bi baldarî serî heya binê lingê wan hevalan bi çavên xwe şopand. Kurê Tolhildan di dilê xwe de got**:**

-Nebaşî ji van mirovan çênabe?

Wî hevalî ji bo kurê Tolhildan got**:**

-Tu yê ku ve biçî? Ew telisê li pişta te çi tê de ye ?

Kurê Tolhildan**:**

-Nan e, ez ê ji bo şervanan bibim.

Heval got**:**

-De ka telîsê bide min, ez ê deyînim ser barê hêstirê.

Heval di dilê xwe de got:

-Belê em ji bo van mirovên evqas bi fedakarî, şer dikin û şehîd dikevin; şayan e.

## Wateyên Peyvan

**Qontar:** Nêzikî ber binê çiyan.
**Kel û pel:** Tişt û mişt
**Par:** Behr
**Tolhildan:** Tol rakirin.(heyf)
**Rondik:** Histir, firmêzk

## Em Têbigihin

**1**-Ev şer di navbera kê de çêbibû?
**2**-Mezinê gund çi gote gundiyan?
**3**-Zarokê 12 salî çi ji mezinê gund re got?
**4**-Ji vê serpêhatiyê çi encam tê girtin?

## Destûrên Ziman

**1**-Navê **Tolhildan** ji çend peyvan pêk hatiye, çima ev peyv navê taybet e?
Navê taybet: Ew navên ku heyînekê tenê didin nîşandan.
**2**-Di nivîsa we xwendî de, peyva **şervan** derbas dibe, bi kîjan paşgirê hatiye herikandin.
**3**-Di mijarê de çend peyv bi pêşgiran hatine sazkirin?

## HÎNDARÎ

**1-** Ji mijara we xwendî, hûn çi fêrbûn, bi kinahî di lênûsa xwe de binvîsin.
**2**-Ji mijarên we, vê hefteyê dîtin yekê bi kurtî şîrove bikin.
**Xebatên destnivîs:**
*-Berxwedana pakrewanan roniya rêya me ye.*
-Dest nivîsa tîpên mezin:
*A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z*
Destnivîsa tîpên biçûk:
***a.b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z***

# SEDEY ZANIST



Rewuşt,  zanist, perwerde
Hetwanî zamî Kurde
Mirov be bîr û zanist
Hewldan, tekan tewanist
Têdega çon dinyayî nuwê
Serdekewê nanewê
Her rojew dahênanê
Core berhem hênanê
Zorbûnî amêrekan
Geşt berew estêrekan
(Kompîuter) û (ênternêt)
Nezanîn le gor enêt
Hengawî(fotokopî)
Şoreşe dij be kipî
Emane giştî bo gel
Mayeyî sûdin bo komel
Roley Kurdim ba êmeş
Lem rote nebîn bê beş
Mêjû (hezarey sê)
Berêz nawman binûsê






***Elî Bextewer***

## Wateyên Wuşekan

**Rewuşt**: Hoy
**Hetwan:**Çare-çareserî-derman
**Zam:** Birîn
**Tekan:**Bizav
**Tewanist:**Dikarin
**Şiyan:** Karî
**Nanewê:** Naçim
**Dahênan:** Dirustkirin
**Hênan:** Anîn
**Zorgûn:** Zêdebûn
**Berew:** Bir
**Enêt:** Belavkirin
**Hengaw:** Pêngav
**Kipî:** Bêdengî
**Nawman:** Navê me

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1- Dema koşkar tê gotin hûn çi tê digihin?**
**2-Çima Koşkar ji Xemgîn heS kir?**



# KOŞKAR

Xemgîn sêwî dimîne. Ji ber ku li bajarê Wanê kesekî wî nemabû. Bi alîkariya ciranan rê kirin Iraqê mala meta wî. Ji ber ku Xemgîn zimanê wî welatî nedizanî, gelek bêzar bibû.
Bi vî awayî demeke dirêj bê deng mabû.

Rojekê, meta wî dengekî bilind gazî firoşgerê di kolanê de derbas dibû kir. Firoşger tûrê li ser milê xwe danî ber deriyê malê û bi meta Xemgîn re axivî. Di dawiyê de çend pêlavên qetayayî danîn ber koşkar û li ser kursî rûnişt. Xemgîn bi gumanî li pêşberî wî rawestiya bû. Xemgîn ji ber biyaniya xwe gelek bêzar bû, li wan mîxên koşkar dikirin devê xwe û bi lez û bez li binê pêlavan dixist dinêrî.
Di navberekê de Xemgîn bi dilşadî, ji bîr kir li kû ye û li gel kê ye, bi zimanê dayîka xwe, axivî:
-Ma ev mîx (bizmar) di devê te re naçin?
Koşkar di nav çoşekê de, serê xwe bilind kir.
-Ma tû kurê Kurdan î lawo?
-Belê, ez ji bajarê Wanê hatime.
-Ez jî ji Tatwanê me.



Dema ku Xemgîn zanî koşkar Kurd e û ji aliyê Tatwanê ve hatiye û bi baldarî li wî nêrî.
Xemgîn mala xwe ya li taxa Xaçortê ji koşkar re diyar kir. Dema ku li gel hevalên xwe masî, ji golê digirt, dema li gel dayîka xwe diçû cem bijîşk çawa li şemendefirê siwar dibû, ji koşkar re şîrove kir.
Di rastiyê de jî yê dipeyive Xemgîn bû; Xemgîn, ji şeş mehan û şûnve bêdeng mabû. Bêyî ku rawaste û biweste dipeyivî. Koşkar hem dixebite, hem carcaran digot; Erê ya rastî, wisa ye, ji bo Xemgîn bide peyvandin digot.
Ji bo ku koşkar hêj zêdetir guhdariya Xemgîn bike, destê xwe giran dikir.
Lê, di dawiyê de hemû pêlav hatin dirûtin û kar temam bû.
Xemgin bi dilekî nexweş pirsî**:**
- Ma tû yê biçî?
- Belê, ez ê biçim, min karê xwe temam kir.
Koşkar dît ku hemwelatiyê wî yê biçûk digirî.
- Negrî lawo! Negrî.
Êdî Xemgîn negirî. Ew û koşkar bûn hevalên hev.

## Wateyên Peyvan

**Bêzar:** Aciz
**Koşkar:**Pêlavçêker – mişeq, solbend
**Tatwan:** Navçeya bajarê Bedlîsê

## Em Têbigihin

**1**-Di serpêhatiyê de li ser milê mirovê hatî gazîkirin çi hebû?
**2**-Koşkar çawa zanî Xemgîn Kurd e?
**3**-Hevpeyvîna Xemgîn bi koşkar re hesteke çawa şiyar kir?
**4**-Dema koşkar çû, çima Xemgin girî?

## Destûrên Ziman

**1**-Di hevokên jêr de peyvên "**ma, gelo, çima, çiqas, çi, çend, kengê**" hevokan dikin rewşa pirsyarî.
**Minak:**
**-Ma tû yê biçî?**
**-Gelo tû yê bêyî?**
**-Çima diçî?**
**-Çiqas ma ne?**
**-Çi dixwazî?**
**2.** Di hevokên jêr de cihê bêhnokan çawa hatiye diyarkirin binasin.
-Koşkar hem dixebite hem carcaran digot.
-Erê, ya wisa ye, ji bo Xemgin bide peyivandin.
Di zimanê Kurdi de hêmaya herî zêde tê bikaranin, **hêmaya bêhnok** e (,).

## HÎNDARÎ

**1**-Bi hevalekê xwe re li ser girîngiya zimanê dayîkê bipeyivin.
Di dema peyvînê de li ser van xalan şiyar bin.
**a**.Peyvîna hevalê xwe nebirin.
**b**.Peyvên rast bêjin.
**c**.Awaza xwe baş bi kar bînin.
**d**.Pirsên tê kirin, bersiv bidin.
**2-**Serpêhatiyeke ku we jê hes kirî ji hevalên xwe re bêjin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-We hevalekî ku we jê hez dikir, hûn jê dûrketine?**
**2-Dema nexweşiyeke giran ser hevalên we de tê, hûn çi hîs dikin?**

## BÎRANÎN

Her diçû, berf zêde dibarî; rê û rêbar hatibûn girtin. Ji zarokan yek nehatibû dibistanê, vê sibehê zarokan ji min re nûçeyeke nexweş anî.

Dema duh êvarê zarokan ji xwe re di nav bexçe de dilîstin. Rojîna biçûk winda bibû.

Wan bawer dikir ku wê piştî demekê bizivîre. Lê demjimêr derbas bûn, hêj zarok diyar nebibû. Wê demê cîran agehdar kiribûn. Gundî tev li Rojînê digeriyan. Nedihat zanîn bi ku ve çûye û şopa wê nediyar bû.
Heya nîvê şevê, li hemû deveran hatibû nêrîn.
Di vê şeva ku çav çavan nabînin û bi bager û bahoz de, bêhêvî bûn di hundirê min de rûniştibû.



min çavên xwe êşandibû, min çira temirand.
Her diçû, bahoz zêdetir dibû, derî û pencereyên me dihejandin. Çend demjimêr derbas bûne nizanim. Herwekî ji aliyê baxçe ve li derî didin. Min dengekî wiha bihîst û guhdarî kir. Ji nava şevê nalîneke giran wek ya mirovan dihat guhên min. Di cih de, min xwe ji nav cihê xwe avêt, ji bo ez bi sermayê nekevim, min mêzer avêt ser milê xwe û bezîm, min xwe berda jêr.

Armanca min, ew bû ku ez biçim Bîşeng Xanimê ji xew rakim lê wê jî; ev deng bihîstibû, di destê wê de çirayeke biçûk ew jî derketibû, ber deriyê malê.

Got:

-Ew kî ye" da ber qîran. Bersiv nebû. Bîşeng Xanimê carek din jî bang kir. Di wê demê de, di nava fîzêna bahozê de, nalina dengekî zirav me bihîst. Bîşeng Xanim**ê** da ber qîran:

-Tû kî yî!

Lê, min deng nas kir:

- Rojîn tû yî? Bi coşeke mezin min derî vekir.

Min, ew bir odeyê, xist nav nivînan. Her ku diçû rûyê Rojînê sor dibû, çavên wê geş dibûn.
Di cîhanê de ji kirina qenciyê baştir tiştek nîn e. Ev odeya tarî zivirî hêlîneke bextewar…

## Wateyên Peyvan

**Bahoz:** Bayê li gel baran û berfê.
**Armanç:** (Hedef) Tişta pêkanîna wê tê xwestin.
**Çira:** Ji bo ronîkirina şevê, amûrek e.
**Mêzer:** Amûrek ji pêdiviyên malê yên ji rîs çêdibe ye.

## Em Têbigihin

1-Ji nivîsînên rojane re çi tê gotin?
**2**-Di mijarê de ji jiyana Rojinê hûn çi fêr bûn?
**3**-Sojeya mijarê çi ye?

## Destûrên Ziman

**1**-Peyvên li jêr, di nav hevokan de bi kar bînin, wan hevokan jî li lênûsa xwe binivîsin.
Kengê, kî, çawa, çiqas, çend, çima
**2**-Hûn dizanin **sê xal (...)** nîşana berdewamkirinê ye.
**3**-Di Zimanê Kurdî de alavên **gihanek û girêdanê** ev in: "**û, jî, ku, lê**".
**Mînak:** Azad **û** Zozan di refekê de ne.
Bêrîvan **di** refa sê û Hewar jî ya pêncan **de** dixwîne.
-Heval Rewşen dixwîne **ku** zana bibe.
-Binevş ser ket **lê** Sosin ma tê de.

## HÎNDARÎ

**1**-Sergotara mijarê çi ye? Ev sergotar û tiştên di mijarê de tên şîrovekirin hevdu digirin yan na? Hûn jî sergotareke bi kêrî mijarê bê, bibînin.
**2**-Nivîsekê li ser roja mamosteyan binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Name çawa tê nivîsandin?**
**2-Nameyekê ji hevaleke xwe re binivîsin.**

# NAME

**Mamosteya min;** **30.12.2013**

Sal çiqas zû derbas bûn. Lê her tişt wek duh li bîra min e. Roja min a destpêka dibistanê bû. Ez li gel dayîka xwe hatibûm dibistanê. Dîsa jî ez di nav tirsek mezin de bûm. Wê bi ken li rûyê min nêrî, pirsa navê min kir û bi dilovanî destê xwe li ser serê mîn danî. Ez ji tirsê rizgar bûm. Çiqas ez dilşad bûm ku min dest bi dibistanê kirî. Pir zû fêri dibistanê bûm.
Dema ez fêrî xwendin û nivîsandinê bûm, hûn ji min dilşadtir dibûn. Baweriyeke mezin bi min re çêbû. Êdi ez dikarim xwe fêrî hemû tiştan bikim.
Niha ez di refa 5'an de me. Dihizirim gelo çiqas ez fêrî tiştên nû bûme? Lê ez dizanim, pêwîst e fêrî gelek tiştên din jî bibim.
Ez ê tû caran wan rojan ji bîr nekim. Mamosteya min, ez sersala we pîroz dikim, rojên bi tenduristî ji we re dixwazim.
Silav û rêz.

Rûken Gabar
wajo

Taxa Xaçok
Kolana Botan
Jimara Malê:105
Wêranşar/Riha



## Wateyên Peyvan

**Dilşad:** Kêfxweş
**Tenduristî:** Saxlemî, sihet

## Em Têbigihin

**1**-Di nameyê de zarok çawa bang li mamosteya xwe dike?
**2**-Zarok, ev name bi boneya çi nivisandiye?
**3**-Zarok di nameya xwe de çi tîne zîman û çawa dawî lê tîne?
**4**-Wajo (imze) nav û paşnavê namehinêr li kûderê ye?

## Destûrên Ziman

**1**-Cînavên di hevokên jêr de kîjan in?
-Hûn ji me zêdetir dilşad bûn.
-Baweriya we mezin bû.
-Hûn ji me çi dixwazin, em ê bidin we.
*Ew peyvên cihê navên kesan digirin em ji wan re dibêjin **cînavên kesane.***
Cînavên kesane ev in:

| | |
|---|---|
| **Ez** | **Em** |
| **Tu** | **Hûn** |
| **Ew** | **Ew** |

**2**-Roj, heyv û dîroka namehinêr diyar dike bi kîjan hêmayan hatiye cudakirin?
Ji bo ku em; roj, sal û heyvan diyar bikin, em hêmaya xal an jî xêzika xwar bi kar tînin.
**Mînak**: 30.12.2013
30/12/2013
**3-**Di nameyan de carna xal di dawiya navên kurtkirî de tên bikaranîn:
**Mînak:** Prof. Dr. Bj…

## HÎNDARÎ

**1**-Nameya we xwendî lêkolîn bikin pêwîst e di nameyekê de çi cih bigire vekin.
**2**-Ji bo mamosteya xwe nameyekê binivîsin.
**Awênê têgira namê:**

Hinêr………………
Navnîşan…………….

**PÛL**

Ji bo………………….
Navnîşan…………..
Bajar……….............

**Pul**: Parçekaxezeke fermî ye ji postexanê tê standin, li şûna dirav tê bikaranîn.
**Mînaka Pîrozqertê:**

**Xalê min ê xoşewîst;**
**Ez sersala we pîroz dikim, daxwaza rojên bi tendurist û bextewer dikim û destên we maçî dikim.**

Hûn jî pîrozqertekê ji nasê xwe re rêkin.
**3**-Weke mînaka li jor, hûn jî pîrozqertekê binivîsin, ji kesê hûn jê hes dikin re rê bikin.

## MIJARA SERBEST

# WELATÊ ME

Piştî ku mamoste li ser dep, “**girîngiya welatê me di cîhanê de çi ye**?” nivîsî. Li xwendekaran zivirî**:**

-Zarokno, lênûs û pirtûkên xwe bigirin. Di vê waneyê de em ê li ser vê pirsa ku hûn li ser dep dibînin, baxivin, hindekê bihizirin, piştre yek bi yek mafê axaftinê bigirin û bipeyivin.

Dîcleyê destpêkê mafê axaftinê girt û wiha got**:**

-Em neteweke ji gelek cîranên xwe mezintir in. Zêdetirî çil milyon şênî ne. Gelek welat hene ku hem di hêla xakê de, hem jî di hêla şêniyan de ji me kêmtir in.


Xabûr mafê axaftinê girt û wiha peyvî**:**

-Gotinên hevala me Dîjleyê anî ziman, tev rast in. Lê, li gorî min girîngiya welatê me ji cih girtina wê ya erdnîgariyê tê. Welatê me, dikeve parzemîna Asya, riyên bazirganiyê yên girîng; “Hevrişîm û Baharat” tê re derbas dibin. Du golên mezin “Wan û Ûrmiye” tê de cih digirin.

Kajînê, ji mamoste mafê axaftinê girt, wiha dest bi axaftinê kir**:**

-Ez tevlî gotinên Xabûr anî ziman dibim. Welatê me di warê xweşiya xwezayî û bermayên dirokî de jî xwediyê girîngiyeke mezin e. Cihê çavkaniya pêşketina mirovahiyê ye, ji ber vê bala gelek şaristaniyên biyanî dikişîne.

Mafê axaftinê gihabû Warger**:**



-Welatê me di warê dewlemendiyên ser xak û bin xak de jî xwediyê girîngiyeke mezin e. Ji binxaka welatê me gelek cûrên kanzayê tên derxistin. Di warê av û robarên xwe de jî pir dewlemend e. Gelek cûrên çandiniyê lê tên çandin. Di warê lawirvaniyê de jî welateke pir dewlemend e.
Piştî van gotinan mamoste ji Hozan pirsî**:**
-Tû çî dihizirî? Hozan
Hozan mafê axaftinê girt û got:
-Hevalên min gelek tiştên xweş anîn ziman. Ji wan cudatir, girîngiya welatê me, ji welatên cîran; di welatê me de gelek çavkaniyên petrolê cih digirin. Petrol kanzayek pir girîng e. Em dikarîn sûd jê bigirin.
Piştî van gotinan mamoste, wiha peyvî**:**
-Hûn gelek bijîn zarokno! Hûn gelek xweş axivîn.
Ji ber ku welatê me di cîhanê de, cihekî girîng digire. Di cîhanê de girîngiya welatê me zêdetir dibe. Bi vê boneyê, çavên gelek hêzan li ser waletê me ye.
Welatê me di cihekî stratejîk de cih digire. Ji bo pêşketina welatê me çavên gelek dewletan bar nabe, ji ber vê jî di gelek hêlan de astengiyan derdixin. Di warê aborî û ramyarî de, naxwazin welatê me bigihîje Neteweke Demokratîk.




## Wateyên Peyvan

**Kanza:** Kanên xwezayî
**Maf:** Heq
**Bazirganî:** (Ticaret)-Kirîn û firotin
**Bermayên dîrokî:** Kelepor- kelhe, peyker, cer û gelek tiştên din.
**Peyker:** (Heykel)
**Stratejîk**: Cihekî girîng

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Aram Tîgran kî ye?
2-Çima Rêber Apo ji Aram Tîgran hes dike?

## ZAR BÛMA




Sibê zû şiyar bûma
Pêxwas û bê şal bûma
Ling terikîn, lêvên ziwa
Xwezî dîsa  zar bûma

Çawa berx û bêzar bûma
Bê mal û bê kar bûma
Ruhê sade tu yî can
Xwezî dîsa zar bûma

Hespê kumêt siwar bûma
Ji çiyê berwar bûma
Bimama bê deng û nav
Her tek, tenê zar bûma

***ARAM TÎGRAN***



## Wateyên Peyvan

**Zar:** Zarok
**Pêxwas:** Bê sol/pêlav

## Em Têbigihin

**1**-Di helbestê de hevoka “Xwezî dîsa zar bûma.” de çi dide diyarkirin?
**2**-Ramana bingehîn ya vê helbestê çi ye?
**3**-Ramana bingehîn di kîjan malikan de diyar dibe?
**4**-Aramê Tîgran ji ku ye?

## Destûrên Ziman

**1**-Peyva dawiya rêzikên helbestê, lêkolîn bikin, wekhev hatine nivîsandin yan ne?
***Qafiye:****Ji wê wekheviya dengê li dawiya rêzikên helbestan tê karanîn re* ***qafiye*** *tê gotin.*
**2**-“Rêzikên malikeke helbestê lêkolîn bikin, jimara kiteyan wekhev e yan ne?
*Ji wekheviya kiteyên rêzikan re* ***pîvan*** *tê gotin.*
**-**Ji bîr nekin, di helbestên serbest de pîvan ne merc e.
3-Malikên helbesta we xwendî, ji çend rêzikan pêk hatiye?
4- Hûn jî helbesteke çar rêzikan, ji dû malikan pêkhatî binivîsin.

## HÎNDARÎ

1-Di helbestê de çi bangawazî hatiye kirin?
2-Helbest bandorek çawa li hestên mirovan dike?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Rûvî çawa tê naskirin? Bizanin.**
**2-Taybetmendiyên dîkan çi ne?**





# BANGA AŞTIYA GERDÛNÎ

Dibêjin carekî, li bazargeha tebayên kedî gelek cûrên lawiran hebûn. Di nav tebayên nêr de dîkekî dengxweş, sor, zulfdirêj; zana û bi hêz hebû. Rojekê ji rojan, hêj zû tevayî mirîşkan di gel çîçokên xwe, di nava xurûşekê de derketin. Ji nişkan ve xwe ji derveyî herêma xwe dîtin.

Di vê xaka biyanî de gelek curên dexil, ceh, genmok; yanî hemû cûrên çênî dihatin dîtin û wan jî bi kêfxweşî dixwarin. Dîk jî xwe di cihekî biyanî de dît. Li rast û çepê xwe nêrî lê kesekî nas nedît. Şaş ma û tirseke mezin ket dilê wî. Tam dema xwe amade dikir ku paş ve bizivire û dûr bikeve, çi bibîne! Dît ku rûviyek bi qevzên mezin û rast pêşberî wî tê. Dema dît, ket nav gumana windakirina giyanê xwe, pişta xwe da neyarê xwe û heya jê hat çengên xwe vekir û fir da ser dîwarekî. Ev cihê ku dîk çûyîyê ti caran rûvî nedikarî xwe bigihîne wê derê, ji bo niştina wî jî cihek herî baş bû.



Dîk serê xwe bilind kir û bang da. Rûvî jî bêhn bizdayî xwe gihand binê dîwar. Piştî ku zanî nagihîje dîk, dest bi daxwaziyê kir. Silav lê kir û got: “Silavên aştî li ser te be, ey birayê rûken, hevalê birêz!” Lê dîk xwe nebihîstî kir. Silava wî venegerand, nexwest li rûyê wî jî binêre. Dema rûvî bi vî awayî dît û got: “Dostê min, ey tiştê herî nazik: Ez hatibûm nûçeyeke pir girîng ji bo te bibêjim, lê tû, çima silavên min nagirî, heya li rûyê min jî nanêrî?” Lê dîk, guh neda van gotinên salûs û di paşguhê xwe re avêt. Rûvî jî dîsa dest bi peyvînê kir: “Ax binêre! Te bizaniya, ez ji bo çi hatime erkdarkirin. Tê di cih de hatibûya xwar û ez hembêz kiribûma û devê min maçî kiribûya. Bizane birayê min, paşayê lawiran şêr û siltanê balindeyan baz, di nav mêrga kulîlkên rengîn de hevdîtin çêkirin. Nûnerên hemû tebayan di vê hevdîtinê de; (piling, kund, gur, baz, qijak, sivorî, torî, kêvroşk, kevok, bilbil, û tebayên kedî) kom bibûn. Herdû paşan pêşberî hemû tûxmê xwe, daxuyaniya xwe ya pîroz ya li ser aştî û biratiyê ku li ser rûyê cîhanê aştî û azadî pêk were û di navbera tebayên kedî û kovî de, kîndarî nemîne, heskirin û dostanî pêş bikeve, weşandin. Bi heman biryarê ez ji bo belavkirina van nûçeyan hatime erkdarkirin.”

Lê dîk gûhdariya van gotinên xweş nedikir û bi çavên xwe yên girover her tim li dor xwe dinêrî. Rûvî dîsa dest bi axaftinê kir: “Birayê min tû çima bersivekê nadî vê biryara paşayên me, şêr û baz. Tû min neçar nehêlî ku ez giliyê te li ber wan bikim. Yê ku ji aştiya gerdûnê re bibe asteng, tawanbar e.”

Dîk heya wê demê bêdengiya xwe parastî, serê xwe dirêjî jêr kir û got: “Bi rastî birayê min; gotinên te li ser, ser û çavên min. Rêzdariya min ji bo kesayetiya siltanê min heye. Heger ez bersivê nedim te, ev ji nezanîna min e. Ez bi serê te sond dixwim, ji ber ku ez hinek tiştên dûr dibînim, serê min dizivire.”

Rûvî got: “Yezdan ji te razî be birayê min. Tû li ser wê derê çi dibînî?”

Dîk hêj zêdetir stûyê xwe dirêj kir û got: “Li ezmanan gelek bazên ji bo nêçîra xwe digerin dibînim.” Dîk stûyê xwe di deştê de dirêj kir li rast û çepê xwe nêrî û got: “Belê li ser rûyê xakê lawirekî çar ling û lingên wî zirav û dirêj û guh şûr dibînim. Ev lawir bi lezgînî bi alîyê me ve dibeze û nêzîk dibe. Yezdan me biparêze! Ev tajiyek e.”

Dema rovî ev gotin bihîst, got: “Birayê min ez neçar im, destûrê ji te bixwazim!” Piştî ku wiha got; ji Yezdan parastin xwest û lingên xwe li ber ba berda û revî. Herwiha dîk jî rizgar bû.

## Wateyên Peyvan

**Dîk**: Keleşêr.
**Bazargeh**: Cihê kirîn û firotinê.
**Baz**: Firindeyê herî bi hêz û nêçîrvan.
**Tawan**: Binas (suç).
**Kedî**: Tebayên mala.
**Zulf**: Pirtikên dirêj yên dîk, bisk.

## Em Têbigihin

**1**-Çima dîk bersiva rovî nedida?
**2**-Ji bo çi rovî gotinên aştiyê ji dîk re digotin?
**3**-Rovî ji ber çi dîk hişt, bazda û çû?

## Destûrên Ziman

**1**-Li peyvên jêr binêrin ên bi tîpa dengdêr dawî lê hatine lêkolîn bikin.

| | |
|---|---|
| **Amedî** | **Amediyên** |
| **Zevî** | **Zeviyên** |
| **Rêwî** | **Rêwiyên** |

Di zimanê me de dema du tîpên dengdêr li pey hev tên tîpên kelijandinê dikeve navbera wan. Em ji tîpên "**h, w, y**" re dibêjîn **tîpên kelijandinê (tîpên siwar)**

**2-Kar** çi ye? Dema bi paşgira (**ker**) li ser kar bê zêdekirin çi wate derdikeve?
Peyva kar û karker di hevokan de bi kar bînin. Hûn jî paşgira ''**ker**'' li ser peyvên ''**zêr, mal**, **direw, saz**'' zêde bikin.
Paşgirên ku peyvên nû tafirînin ji wan re **pêvekên sazker** tê gotin.
Pêvek, di nav xwe de dibin du beş:
**a-Pêvekên sazker**
**b-Pêvekên kêşan**



## HÎNDARÎ

**1**-Hûn jî bûyerek her tim di dilê we de mayî binivîsin.
**2**-Karê ku hûn di waneya wêne de dikin, bi rêzê ve bi çend hevokan bînin. ziman.

## DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINÊ

Di pêşketina mirovatiyê de heta niha jinan, pêşengiya civaka xwezayî kirine û erkên sereke pêk anîne. Di dîroka mirovatiyê de, jiyan bi destê jinan pêş ketiye û hatiye avakirin. Ji bo wê jî, jin û jiyan bûne yek. Jin pîroz tê dîtin. Girêdana jinê û xwezayê jî pir bi hev re heye.

Di heman demê de, jina Kurd jî, ji serdema Neolotîkê ve, ji nirxên civaka xwezayî re rêbertiyê dike. Jiyan, li derûdora jinê hatiye avakirin. Di milê çandinî û kedî kirina lawiran de, jina Kurd, erkeke sereke lîstiye. Zagona malê, çand û ehlaq ji aliyê jinê ve hatiye avakirin û parastin. Çand û zimanê Kurdî jî ji aliyê jinan ve hatiye pêşxistin û parastin.


Li gorî ku li Kurdistanê, ji aliyê dagirkeran ve gelek polîtîkayên tunekirin û helandinê hatine meşandin jî lê jinên Kurd (bi taybetî dayîkan) çand û zimanê Kurdî parastine û heta roja me ya îro jî anîne. Ji bo wê em deyndarên dayîkên xwe ne. Di serhildanên ku li Kurdistanê hatine destpêkirin de jî jinan erkên sereke leyîstine û pêşengtî kirine. Besê, Zarîfe û Leyla Qasim, ji serhildanên ku di Kurdistanê de pêş ketine re pêşengî kirine û ristekî girîng leyîstine. Bi lehengiyeke mezin li hemberî dagirkeran li ber xwe dane û şehîd ketine.

Bi taybetî bi derketina Tevgera Azadiya Gelê Kurd re, herçiqas bedelên giran biha hatibin dayîn jî, lê, ji bo jina Kurd, bû mîladeke nû. Bi saya Rêber Apo, jin hîn pirtir li ser lingên xwe dikarin rawestin û bibin xwedî vîn. Li Kurdistanê, di roja me ya îro de, jin bi her awayî rêbertiyê ji jiyan, şer, serhildan û siyasetê re dike. Di têkoşîna rizgariya gelê Kurd de jî gelek lehengên weke heval Bêrîtan, Bêrîvan û Zîlan bi awayeke lehengî li hemberî dagirkeran li berxwedan û şehîd ketin, bûn ronahiya jiyanê. Jina Kurd îro ji jinên Rojhilata Navîn û cîhanê re pêşengiyê dikin. Di sala 1998' an de, Rêber Apo Bîrdoziya Rizgariya Jinê diyariyê jinan kir.

Ji niha û pê ve jî, pêwîst e her Keçika Kurd dîroka xwe baş bizane û li gorî wê hîn pirtir, azad û bi vîn tev bigere. Divê hîn pirtir bi çand û dîroka xwe ve girêdana wê hebe û li gorî pîvanên bîrdoziya rizgariya jinê tev bigere.





## TEST 2

**1**-Di hevokên li jêr de peyvên hatine reşkirin kîjanê pêveka sazker girtiye?
**A.Cizîra** Botan warê Mem û Zînê ye.
**B.Cegerxwîn** hozan e.
**C.Gavanê** gund mirovekî baş e.
**D**.Serjêkirina **kûviyan** bêwijdanî ye.
**2**- Ji ramana bingehîn ya mijarekê re çi tê gotin?
**A.**Têbinî **B.** Daxuyanî **C.** Soje **D**. Diyarkirin
**3**-"Hûn ji xwendina pirtûkan hes dikin?"
Ji hevokên jêr kîjan nebersiva erêniye?
**A.**Nexêr, pirtûkan naxwînim.
**B.**Pirtûka baş diparêzim.
**C.**Erê, ez ji xwendina pirtûkan hes dikim.
**D.**Her heyv pirtûkekê distînim.
**4**-Di kîjan hevokên jêr de peyva "**dest**" di wateya xwe ya rast de hatiye bikaranîn.
**A.**Destê min têşe.
**B.**Destikê derî şikest.
**C.**Ji bo xebatê, hevalê min destek pirtûk dan min.
**D.**Deste ya ziman pirtûk çêkirin.
**5**-Di kîjan hevokên jêr de cînav hatiye bikaranîn?
**A.**Min ev dar çand.
**B.**Hewaya wî bajarî gelek xweş bû.
**C.**Ji niha û pêve baş bixwîne.
**D.**Evîn çû mal.
**6**- Dihevokên li jêr de peyva kû ji yekî zêdetir heyînan diyar dike kîjane?
**A.**Dar şîn e. **B.** Darvan êzingê tîne. **C.** Daran pel dan. **D.** Darê kulîlk vekir.
.

**7**-Ji hevokên jêr, kîjan bê destûr e?
**A.** Hat payîz bilbil.
**B.**Tû yê hêlina xwe li kû çêkî?
**C.**Hêlîn ket xwarê.
**D.**Tû yê li ber baranê şil bibî.
**8**-Di kîjan hevokên jêr de navê **giştî** nîn e?
**A**.Xwendin ronahiya jiyanê ye.
**B**.Jiyana bêperwerde, jiyanek sexte ye.
**C**.Gola Wanê mezin e.
**D**.Berê giran di cihê xwe de baş e.
**9**-Ji birepeyvên li jêr kîjan bêhevalnav e?
**A**.Gula sor.
**B**.Çiyayê bilind.
**C**.Berfa spî.
**D**.Lênûsa Gulistanê.

**BEŞA III**

**XEBATÊN AMADEKARIYÊ**

1-Herî zêde hûn ji kîjan demsalê hes dikin?
2-Di salê de çend demsal hene?
3-Aşût di kîjan demsalê de çêdibe?



# AŞÛT

Weke hemû demsalan, gelek taybetî û ciwaniyên girêdayî demsala zivistanê jî hene. Ji xwe ew berfa ku dibare; zarok di nav de bi gulatan dilîzin. Ew jî aliyekî xweşiya zivistanê ye. Bi taybet xurûşa xişikandina ser berfê tiştekî cuda ye. Çêkirina peykerê ji befrê û piştre li ber gulatên berfê xwe ragirtin, di hewaya sar de lîstin çiqas xweş e!
Di zivistanê de gelek aliyên berfê yên nebaş jî hene. Aşût dibe sedema karesatên mezin, jê re dojeha spî tê gotin.

Barîna berfa zêde di herêmên çiya û cihên bilind de, tebeqeyeke berfa stûr tê holê. Aşût bi lerizîna her cihek ê wê berfê tên holê. Tebeqeya berfê di encama şikestinê de, ji jor ber bi jêr ve her ku gêr dibe û komên berfê çêdibin. Ev komên berfê dizeliqin, dema ku rastî cihên avahî bên, malan bi tevayî wêran dikin. Malên di bin berfê de dimînin hildiweşin.

Tenê aşût ne bi berfa zêde li ser hev diheze, carnan jî ji sedema barîna berfa zêde tê holê. Carnan jî, ji ber germbûna xakê jî aşût çêdibin. Ew valahiya, di van tebeqeyan de dibe sedema berf bi hêsanî bilive û bişemite. Gurîna ezman, dengên mirovan, dengê top û tifingan dibe sedema lerza berfê.

Li navendên xişikandinên berfê, bi taybetî cihên ku aşût lê çêdibin, pêwîst e her gav daxuyaniyên gel şiyarkirinê bên dayîn. Ewlekariya herî girîng li hember aşûtê, cihên ku berf lê heyî car car mirov bi xwe lerzandinên biçûk bîne holê û karesatên aşûtê kêm bike.



Dîsa pêdivî bi çandina daran û parastina daristanan heye. Lewra astenga herî bingehîn li pêşiya aşûtan û hezana xakê, dar û daristan in.

## Wateyên Peyvan

**Aşût:** Şape, hezana berfa bikomikî.
**Daristan:** Cihên têr dar.
**Ewle**: (Tedbir), xwe parastina li hemberê tirsnakan.
**Hezandin:** Zelandin, tehisandin.

## Em Têbigihin

**1**-Di nivîsê de kîjan taybetmendiyên demsala zivistanê hene?
**2**-Çima ji aşûte re, hatiye gotin "dojeha spî?"
**3**-Aşût çawa çêdibe?
**4**-Ji bo ku em ji aşûtê bên parastin, pêwîst e em çibikin?
**5**-Di mijarê de, parastina li hember aşûtê di kîjan bendê de tê ziman?

## Destûrên Ziman

**1**-Di hevoka jêr de kîjan navê pirjimar e?
Weke hemû demsalan, gelek taybetî û cudahiyên girêdayî demsala zivistanê hene.
**2**-Navên bi paşgiran hatine sazkirin li lênûsa xwe binivîsin.
Aş**van – **kar**ker – **rojname**ger – **masî**gir – **wêne**kêş**
Navên ku bi pêvekên sazker yên mîna;"**van, ker, ger, gir, kêş**" standine navên nû sazkirine.
**Mînak:** Aş + van = Aşvan
Kar + ker = Karker
Rojname + ger = Rojnameger
Masî + gir = Masîgir
Wêne + kêş = Wênekêş
Pêveka pirjimariya navan:**"an**" e. Dema dikeve li ser navekî, wî navî dike pirjimar.
**Mînak:**Hesp dibeziya. (yekjimar)
**Hesp + an = Hespan** giya xwar. (pirjimar)

## HÎNDARÎ

**1**-Di benda yekê de ciwaniyên demsala zivistanê, di benda duyem de jî nebaşiyên zivistanê tên ziman.
**2**-Di bendên din de çi tê diyarkirin? hûn bêjin.
**3**-Di her bendeke nivîsê de hizrekî cuda tê ravekirin, bibînin. Çima nivîsandin bi awayê bend tê nivîsandin?
**4**-Bûyerek yan karesatek we dîtî yan bi serê we hatiye di refê de ji hevalên xwe re rave bikin.

**MIJARA SERBEST**

## KURDISTAN KA

Bax û bostanim ka
Dijmin tev girtin ax
Em anîn cîhan wê
Lê me zû ew berda
Geşt û seyranim çûn
Çavêm li xurbet ma
Guh nadimê çû da
Te ji bîr nakim na, na, na
Ax gulistanim ka
Ax Kurdistanim ka…

***Cegerxwîn***







## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1**-Di 14'ê Tîrmehê de çi bûyer çêbûye?
**2**-14'ê Tîrmehê çi bi gelê me daye qezenckirin?

## BERXWEDANA 14'Ê TÎRMEHÊ

Roja 14'ê Tîrmehê di dîroka Têkoşîna Azadiya Kurdistanê de rojeke pir girîng e. Bêguman 14'ê Tîrmehê bi nivîsandin yan gotinekê nayê diyarkirin û têgihandin. Ji ber ku tiştek jiyan bûye û bi awayekî zindî çêbûye. Ji ber ku ev çalakî di demeke pir nexweş û dijwar de, bê çek û bê artêş bi ser ketiye.

Di sala 1982'an de rejîma Tirk ji bo tinekirina gelê Kurd, ji bo parçekirina PKK'ê herwiha ji bo birîna dengê gelê Kurd, navê azadî, navê Kurd û Kurdistanê neyînin ziman, êrîşeke wisa dest pê kiribû.

Di dem û rewşeke wiha de biryara gelê Kurd di kesayetiya "**Mehmet Xeyrî DURMUŞ, Kemal PÎR, Akîf YILMAZ û Alî ÇÎÇEK**" de derket. Pêşengên Tevgera Azadiyê, hevalên Rêber Apo, di sala 1982'an roja14'êTîrmehê de, li Zindana Amedê, di ruyê dadgerê Komara Turkiye de, biryara çalakiya rojiya mirinê diyar kirin. Ev çalakî di dîroka Têkoşîna Azadiya Gelê Kurd de cihekî

girîng digre. Ji ber ku dijî ramyarî û pêkanîna tunekirinê û mandêlkirina Kurdan, dijî hovîtî û îşkenceya li hember mirovatiyê serhildanek bû. Ev biryar jî, biryara berxwedan û diyarkirina vîna gelê Kurd bû.

Di girtîgeha Amedê de, biryara 14'ê Tîrmehê ji bo komara Tirk bersivek bû. Li dijî xwespartin û xiyanetê wateyeke mezin dida. Belê, bi dewla serê berxwedana 14'ê Tîrmehê ye ku îro dengê PKK'ê li hemû cîhanê tê bihîstin û Têkoşîna Azadiya Kurdistanê li hemû cîhanê belav bûye. Belê, dewla serê vê berxwedana şehîdan e ku yekîtiya beşên Kurdistanê û gelê Kurd gihiştiye vê astê.

Pêwîst e, her welatparêzekî Kurd vê berxwedanê bi bîr bîne, bişopîne û vê berxwedanê bidomîne.



## Wateyên Peyvan

**Dijwar:** Zor, zehmet.
**Vîn:** Îrade.
**Girtîgeh:** Zîndan, sicin (heps).
**Xwespartin:** Di mijarê de tê wateya teslîmbûnê.
**Dewla:** Tê wateya saya serê wan û xêra wan.

## Em Têbigihin

**1**-Em çima roja 14'ê Tîrmehê bi bîr tînin?
**2**-Sedema çalakiya 14'ê Tîrmehê çi bû?
**3**-Çalakiya 14'ê Tîrmehê li kû derê çêbûye?
**4**-Çalakiya 14'ê Tîrmehê bi çi rengî gihişt encamê?
**5**-Encama vê çalakiyê di cîhan û Kurdistanê de çi guhertin çêkir?

## Destûrên Ziman

**1**-Hevalnavên di hevokên jêr de kîjan taybetmendiyên nav dane diyarkirin?
-14'ê Tirmehê rojeke pir **girîng e.**
-Ji ber ku ev çalakî di demeke **pir nexweş** û **dijwar** de bû.
Ji wan peyvên navan di hêla rewş, pesin, jimar û hwd.. rave dikin re **hevalnav** tê gotin.
**Mînak:** Azadê **sor**.
Gula **zer**
**Çar** xwendevan
Keça **ciwan**
**2-**Palvedariya navan a li jêr lêkolîn bikin.

Hogir ê Nêrgizê
Palvedar veqetandek Palvedêr
Palvedariya Navan

Viyan a Cudî
Palvedar veqetandek Palvedêr
Palvedariya Navan

***a**-Di zimanê Kurdî de dema du yan jî duyan zêdetir nav hevdu bidin temamkirin em ji vê temamkirinê re dibêjin **Palvedariya Navan.***
**Mînak:**
Dildarê Meyrê
Palvedariya Navan
***b**-Di zimanê Kurdî de dema peyvek, peyvekê rave dike û raveber nav, raveker jî hevalnav be, jê re **raveka hevalnavan** tê gotin.*
**Mînak**:
Berxwedan a dijwar
Raveber veqetandek Raveker
Raveke hevalnavan

| **nav** | **hevalnav** | **nav** | **hevalnav** |
|---|---|---|---|
| Mirovê | baş | Kemalê | leheng |
| Raveber | Raveker | Raveber | Raveker |

**Raveka hevalnavan**
**Têbînî:** Palvedêriya navan û raveka hevalnavan bi pêvekên veqetandekê çêdibin.

## HÎNDARÎ

**1**-Mijara jêr bi baldarî bixwînin û baş têbigihin.
Hevalên ku çalakî didin destpêkirin bi armanca azadiyê bi zanabûn riya berxwedanê hilbijartibûn.
**a**. Girêdana xwe ya bi şehîdên şoreşê re xurt bikin.
**b**.Hertim wan li bîra xwe bînin û rûmetê bidinê.
**c**.Ji bo doza wan ser bikeve û bigihîje serxwebûnê, bixebitin.

## BIWÊJ

Şînê çû dibistanê. Mamoste di wane de qala biwêjan kir û spartek da refê û got:
-Bila her kes biwêjan ji der û dora xwe berhev bike, binivîse û bîne.
Şînê çû malê, ji diya xwe Xecê û ji bavê xwe Hozan pirsî, lê tenê dû biwêj bi dest xistin. Şînê telefonî hevalên xwe kir, hîn bû ku hemû hevalên wê herî kêm pênc biwêj berhev kirine. Şînê pir xemgîn bû, ew rûniştibû û difikirî. Bala diya wê çû ser Şînê, dît ku Şînê pir xemgîn e û got:
-Keça min tu çima xemgîn î?
Şînê got:
-Dayê hemû hevalên min, herî kêm pênc biwêj berhev kirine; lê min bi tenê dû biwêj bi dest xistine.
Xecê got:
-Keça min tu bi ber bayê hevalên xwe nekeve, çi ji destê te hat, te kir.
Şînê bala xwe da diya xwe ku wê dû biwêj li pey hev gotin. Şînê di cih de nivîsî.
3- Bi ber bayê hevalan ketin.
4- Çi ji dest hat, te kir.
Şînê diya xwe maçî kir û got:
-Dayê spas, te dû biwêj li pey hev bi kar anîn. Xecê jî pir kêfxweş bû, ji ber ku alîkariya keça xwe kiribû. Xwarin amade bû.
Xecê got:
- Şînê, Rodî, destên xwe bişûn û werin, xwarinê bixwin.
Malbat tev rûnişt ku bi hev re xwarinê bixwin. Hozan di ber xwe de mine min dikir û digot:
-Destê min nagihîje wê xwarinê.
Birayê Şînê Rodî li bavê xwe nêrî û got:
-Bavo destê xwarinê dirêj e.
Tev bi Rodî keniyan, Hozan jî keniya û got:
-Mirov dibêje qey mezin bûye û ji nû ve biçûk bûye.
Dîsa tev keniyan.



Şînê dîsa bala xwe dayê ku bavê wê û birayê wê biwêj gotin. Şînê ji kêfan da lotikan û wê her du biwêj di cih de nivîsîn.
5- Destê xwarinê dirêj e.
6- Mezin bûn û ji nû ve biçûk bûn.
Şînê wê çaxê fêm kir ku biwêj li ser bûyeran şîroveyên biçûk in. Heta bûyer neqewime, biwêj jî çênabe. Şînê fam kir ku divê bêtir guhdariya dê û bavê xwe bike. Êdî şeş biwêjên Şînê hebûn, dilê wê xweş bibû û vehêsiya bû.

## Wateyên Peyvan

**Biwêj**: Birepeyvên mecazî
**Spartek**: Karê malê

## Destûrên Ziman

**1.**Biwêjên li jêr lêkolîn bikin.
-*Guhê xwe bel kirin*
-*Dirav û xwelî li balê yek e.*
-*Dilê xwe jê re vekirin.*
***Birepeyvên ku ne di wateya xwe ya resen de, li ser bûyerekê tê gotin û di nav gel de rûniştîn re biwêj tên gotin.***

## HÎNDARÎ

1. Hûn jî çend biwêjan ji dê û bavê xwe hîn bibin û li lênûsa binivîsin.
2. Biwêjên we li malê komkirin, bi panoya refê ve bikin.

# PEYMANAME

Sîpan Welat ê ku li navnîşana jêr rûdine:
"Deriyê çiyê, kolana 15'an, jimar 25 /Amed"
Mala Dildar ZANA yê ku li navnîşana:
"Deriyê Mêrdinê, kolana Tîrêj, jimar 20/Amed"
Ew derên xirabûyî li gor mercên jêr wê çêbike:

1-Dildar ZANA ji bo çêkirinê wê sed hezar (100000) dirav dide Sîpan Welat. Ji van diravan çil hezar (40000) destpêkê daye; yê mayîn jî şêst hezar (60000) piştî dawî anîna kar wê bide.

2-Sîpan Welat, dê çêkirina avahiyê heya 15.4.2014'ê dawî lê bîne.

3-Ger di dîroka hatî diyarkirin de, kar bi dawî nebe, Sîpan Welat ji bo her roja derbas bibe, wê 5000'an bide Dildar ZANA.

4-Eger kar di demê hatî diyarkirin de bê temamkirin û Dildar ZANA diravê xwe yê mayî nede, dê ji bo her roja derbas bibe, wê 5000 dirav bide Sîpan Welat.

5-Her du aliyan jî di rewşeke aloz de darizandina dadgeha Gel a Amedê pejirandine.

Hemû xalên li jor ji aliyê herdû kesên ku navên wan li jêr hatine nivîsîn hatine pejirandin.

| | |
|---|---|
| Wajo | Wajo |
| (xwediyê avahiyê) | ( endezyar) |
| Dildar Zana | Sîpan Welat |

Ev peymaname ji aliyê herduyan ve li ber çavê herdû kesên navên wan li jêr hatine nivîsandin, wajo kirine.


| | |
|---|---|
| <u>Bîner 1.</u> | <u>Bîner 2.</u> |
| Wajo | Wajo |
| Welat Roj | Azad Zana |

## HÎNDARÎ

-Ji ber gelek sedeman, hûn di navbera xwe û hinekan de, peymanamê çêdikin.
-Ji sozên her dû aliyan mercên wan li ber çavan tên girtin.
-Di peymanamê de, tiştên di navbera herdû aliyan de hatî pejirandin cih digire û ji aliyê herduyan ve tê wajokirin.(îmzekirin)
-Peymanameya ku tê amade kirin, bi kêmanî li ber çavê dû kesan tê wajokirin. Peymaname belgeyên fermîn e, ji bo demekê tên hilanîn.
Mînaka li jor di vî alî de lêkolîn bikin, hûn jî li ser mijarekê peymanameyekê binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Ji beriya ku birqe peyda bibe mirovan çi dikirî?
2.Girîngiya birqê di jiyanê de çi ye?



# MIROVÊ CÎHAN RONÎKIRÎ

Edîsonê Emerikî bi afirandina gulopa birqê, di ronîkirina cîhanê de bi ser ket. Edîson sala 1847'ê ji dayîk bûye, sala 1931'ê miriye. Ji ber hinek sedeman di dibistana seretayî, refa sêyemîn de, dest ji dibistanê berda. Piştre bi lêkolîn û ezmûnkirina hindek tiştan, bi hunerê xwe pêş xist.

Edîson di mala xwe de laboratuwareke biçûk çêkiribû. Ji bo ku bikare ji laboratuwara xwe re amûrên pêwîst bikire, di trênê de dest bi firotina rojname û xwarinê kir. Piştre laboratuwara xwe saz kir. Dezgaheke biçûk kirî dest bi rojname derxistinê kir.

Piştî vê yekê Edîson dest bi karê têlgrafê kir. Di wê navberê de amûra ku peyamên têlgrafê digirtin afirand. Li sala 1876'ê li bajarê Emerîqa Bostonê niştecî bû. Bi hevalekî xwe yê Endazyar re kargeha Endazyarî ya birqê damezrand. Bi diravên ji firotina dezgehên têlgrafê çêkirî, bidestxistî, kargeheke mezin vekir. Li wê derê dezgehekî ku di hûrdeyekê de hezar peyv dida û distand, pêş xist. Edîson di sala 1876'an de, di labarotuwarê de pêk anî. Di laboratuwara xwe de yekemîn karê ku dest pê dike, karê telefonê ye. Dema karê xwe yê ser telefonê dewam dikir, Graham Bell telefon afirandibû.

Piştî vê gramofon afirand. Piştre bala xwe hêj zêdetir da ser gulopa birqê. Dînemoya ku beriya wî Zanyar Faraday dîtibû, di ronîkirina kolan û fanûsên deryayî de dihat bikaranîn. Edîson kar dikir ku rêbazeke birqê, ji wê biçûktir, ji bo ronîkirina malan jî bafirîne. Di encamê de karî di cihekî ku hewaya wê hatiye valakirin û bi enerjiyeke kêmtir dihat xwedîkirin de gulopekê bafirîne. Di dawiya sala 1879'ê de, ev afirandina wî ji gel re hat nasandin.

Yek ji afirandinên girîng yên Edîson makîneya sînemaya hemdemî bû ku bi 'Kînatoskopê' dihat binavkirin. Batariya ku ji hesin û nîkelê hatibû çêkirin û bi navê wî dihat naskirin, di wan salan de hatibû temamkirin.

Di sala 1928'ê de "Madalya Rêzgirtinê", ji kongreya welatên hevgirtî yên Emerikî girt. Sala piştî wê H. Ford li ser navê wî mûzeyek vekir. Edîson bi afirandinên xwe yên bêhejmar, ji bo sedsala bîstan, bibe sedsala birqê, rolekî mezin lîst. Ev afirandinên xwe di laboratuwarên ku hejmareke zêde zana û pispor tê de dixebitin, bi pêşxist.



Lampeya yekem



## Wateyên Peyvan

**Gulop:** Lampeya birqê, Ampûl
**Ezmûnkirin:** Ceribandin, Taqîkirin
**Laboratuwar:** Taqîgeh, Cihê ceribandin û vedîtinên nû
**Amûr:** Amraz, alav (alet)
**Nîştecî:** Bicihbûn, cîwarbûn.
**Endazyar:** Muhendiz
**Peyam:** Mesaj, Name
**Gramafon:** Amûrek guhdarkirina mûzikê ya kevin
**Dînemo:** Amûreke ku birqê çêdike û dide.
**Madalya:** Rozeta xelatê

## Em Têbigihin

**1**-Edîson di navbera kîjan salan de jiyaye?
**2**-Afirandina herî mezin a Edîson çi ye?
**3**-Xebatên Edîson bi çi awayî hatin xelatkirin?
**4**-Edîson bandoreke çawa li ser pêşketinên sedsala bîstan kiriye?

## Destûrên Ziman

**1**-Peyvên hemwateyên di mijarê de lêkolîn bikin û hemwateya wan fêr bibin.
***Peyvên hemwate***:*Ew peyvên ku xwendin û nivîsandina wan cuda lê wateyên wan yek, jê re* ***peyvên hemwate*** *tê gotin.*
**Mînak: Mêjû - dîrok**
**Ber - kevir**
**Bedew - Spehî**
**2**- Dijwateya peyvên, "**mezin**, **reşkirin**, **destpêk**" bibînin li lênûsa xwe binivîsin.
***Peyvên Dijwate:*** *Ew peyvên ku wateya wan dijberî hev in, ji wan re* ***peyvên dijwate*** *tê gotin*
**Mînak:**
Reş - Spî
Kurt - Dirêj
Şev - Roj

MIJARA SERBEST

## HÊZA ROJÊ

Rojekê ji rojên destpêka biharê bû. Mirovekî karker sibê zû rabû. Xwe amade kir, taştê xwar û cil û bergên xwe li xwe kirin. Kumê xwe da serê xwe û poşiya xwe li dorê pêça. Qapûtê xwe yê stûr li xwe kir. Ji malê derket çû da ku biçe ser karê xwe. Qederekê ji malê dûr ket. Dît ku dinya pir sar e. Bişkokê qapûtê xwe bi berhev ve anî û riya xwe domand. Bi hemdê xwe qedereke din, di rê de çû. Her ku dinya sar dibû; wî hîn gavên xwe bi leztir diavêtin ku ji bo bigihe ser karê xwe. Mirovê karker dema riya xwe didomand. Bayê banî rojê kir û got:

-Rojê! Hêza min ji ya te pirtir e.

Rojê bersiv neda.

Ba:

- Rojê ma tû min nabihîsî? Ez banî te dikim.

Roj:

- Te xêr e bayê!

Ba:



-Ma min ji te re negot? Ez ji te bi hêztir im.
Roj hinekî bê deng ma, weke ku bibêjî, ev ji kû derket.
Bayê cardin got:
-Rojê, tû wî mirovê heyî di rê de diçe dibînî?
Rojê got:
-Belê, ez dibînim. Miroveke belengaz û karker e. Ji xwe re di rê de diçe. Diyar e diçe ser karê xwe.
Ba:
-Ma min negot ez ji te bi hêztirim? Ka li min meyze bike, ez ê hêza xwe çawa diyar bikim.
Rojê mebesta ba fêm nekir.
Ba dîsa got:
- Ez ê bi hêza xwe wisan bikim, ew mirovê ku di rê de diçe, qapûtê xwe ji xwe bike. Ango ez ê bi hêza xwe qapûtê wî jê bikim.

Rojê dîsa ti wate neda gotin û mabesta bayê.
Bayê dest pê kir. Hêdî hêdî xwe bi hêz kir. Her ku ba, xwe bi hêz dikir. Mirovê di rê de diçû, qapûtê xwe li xwe dişidand û riya xwe bi gavên giran didomand. Bayê hîn zêdetir kir. Xwe zivirand bahozê.

Mirovê di rê de diçû, bi vê bahozê re jî hîn zêdetir, qapûtê xwe li xwe dişidand. Destê xwe dikir bin çengên xwe û hewl dida riya xwe bidomîne. Vê carê ba xwe zivirand bablîsokê. Bablîsokê hewl dida qapûtê zilam jê bike û hêzbûna xwe diyar bike. Her ku bayê xwe bi hêz kir ji bayê xwe kir bahoz. Ji bahozê xwe bablîsok, zilamê ku di rê de diçû, hîn zêdetir qapûtê xwe li xwe dişidand û qapûtê xwe bernedida. Her ku ba lê dida carê pêşde û paşde diçû û dihat. Lê dîsa jî, hewl dida bigihê ser karê xwe û dev ji qapûtê xwe bernedida. Lê bayê, bela xwe jê venedikir. Mirovê karker ji serma û westanê ji taqetê ketibû. Êdî nedikarî riya xwe bidomîne. Ji sermayê xwîn di rayên laşê wî de tevizîbû, nediçû û nedihat. Rengê wî ji sermayê reş û şîn bûbû. Di cihê xwe de bê liv rawestiyabû. Lê tevî  vê jî, bayê bela xwe jê venedikir û dixwest hêzbûna xwe diyar bike. Beramberî vê rewşê rojê hew tahmûl kir û got:
-Bayo!

Ba bersiv neda. Dubare bi dengekî bilind û hêrsbûyî banî bayê kir û got:
-Bayo ma ne bes e! Tû ji wî mirovê karker û belengaz çi dixwazî?
Lê ne xema ba bû. Ba ketibû derd û xema hêza xwe bide diyarkirin. Ka çiqas bi hêz e. Rojê  dîsa dubare, bi dengekî bi hêrs banî ba kir û got:
-Bayo! Dora te xilas, ma êdî ne dora min e?

Ba, ji ber ku tevayî rêbaz bi kar anîbûn, tiştek di destan de nemabû. Ji neçarî dengê xwe nekir û rawestiya. Dor hatibû ku roj êdî hêza xwe diyar bike. Rojê, hêdî hêdî, tîrêjên xwe yên germ berdan ser hawîrdor û mirovê belengaz. Bi germahiya tîrêjên rojê re, gul û giya geş bûn. Mirovê karker jî her ku ji tîrêjên rojê germahî digirt, hêdî hêdî xwîna di rayên laşê wî de qerisî diçû û dihat. Rengê wî yê reş û şîn dizivirî mîna berê. Bi germahiya tîrêjên rojê re rûyê wî geş dibû û dizivirî xwezaya xwe. Her ku tîrêjên rojê germ dibûn, karkerê belangaz bi ser xwe ve dihat. Dest pê dikir ku biçe ser karê xwe. Bi germahiya tîrêjên rojê re, pêwîstiya mirovê belengaz, bi qapûtê stûr nema. Qapûtê xwe ji xwe kir. Hêlmek ji dil kişand. Bi dilekî aram û baweriyeke xurt riya xwe domand û çû ser karê xwe. Di vê navberê de, rojê banî ba kir û got:

Ba! Hêz ne di xurtî û zorê de ye. Ka bibêje, ez bi hêztir im an jî tû?



# XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Mirov bi kîjan amûrê  çûne ser heyvê?
2- Mirovê cara yekem çûyî  ser heyvê kî ye?







# APOLLO LI SER HEYVÊ DANÎ

Çûyîna heyvê bi keştiya esmanî ya çêkirî pêk hatibû. Ji keştiya esmanî ya çêkirî re roket an mûşek tê gotin.

Keştiya esmanî tişteke ku ji aliyê mirovan ve hatiye çêkirin û ji derveyî rojê li derdora gerestêrkên esmanî tê bicihkirin. Ji bo ku roketek bikare ji hêza kişandina xakê derkeve, pêwîst e di çirkeyekê de 8 km lezê bistîne. Eger ji vê lezê kêmtir be, roket dê bikeve erdê. Ji ber ku leza tê dayîn, çiqas ku ew bilind dibe, lez kêmtir dibe.


Dem 19'ê Tîrmeha 1969'an berbanga spêdê, dû esmangerên, Apollo 11 derbasî heyvê bûn û hemû alî di berçav re derbas kirin. Di heman demê de weşanek ji bo televîzyonê jî kirin. Di wê weşanê de, esmanger di valahiyê de, digeriyan, bi hevdu re henek dikirin. Hûrdeyên bi coş û xurûş bi temaşevanan didan jiyandin. Dema ku weşan dihat kirin, "Apollo 11 di valahiya navbera heyv û dinyayê de, ango gihîştibû cihê bêhêza kişandina erdê. Dihat gotin ku cihê hêza kişandinê tine ye, rêwî dikarin li jor bi hêsanî bigerin û li ser şilka serê xwe rawestin. Bi hêsanî, berwarî bi dîwaran ve dikarin bi rê ve biçin û dihat gotin ku ava ku dixwazin vexwin nayê devê wan. Esmangeran, ew tişt ji mirovên cîhanê re diyar kirin.

Li demjimêr 18:25'an lingên Apollo yê mîna pindirê ji bo hêsanî danîna wê li ser heyvê vebûn. Piştî demjimêrekê herdu keştiyên ezmanî ji hev cûda bûn.

Demjimêr 22:02 Astronom pêl bişkokê kir. Apollo derbasî ser heyvê bû. Tevayî televizyonan ev çaxê dîrokî nîşan didan û her kesî, ev weşan temaşe dikir. Belê piştî vê hatina keştiyê ya ku ti caran bi dawî nayê, dest pê kir.

20'ê Tîrmeha 1969'an de Yekşem, demjimêr 22:14, Astronot dibêje: "Apollo 11 li ser heyvê danî.







## Wateyên Peyvan

**Apollo 11:** Navê roketê
**Mûşek:** Fûze
**Gerdûn:** Cihê tevayî gerekstêrkan, Evren
**Ezmanger:** Kesên li esmanan digerin (astronot, kozmonot)
**Pindir:** Tebayekî pir ling e
**Çirke:** Saniye
**Kêlî:** Bêhn, bîstek, dema herî kin

## Em Têbigihin

**1**-Apollo-11 kîjan salê çû ser heyvê?
**2**-Esmanger bi rêya weşana televîzyonê ji bo mirovên cîhanê çi dan diyarkirin?
**3**-Çûna mirovan a ser heyvê, çima bûyereke dîrokî ye?

## Destûrên Ziman

1-Navên kêrî valahiyên jêr tên bibînin û di wan valahiyan de binivîsin. Van li lênûsa xwe binivîsin
................. tarî .................sor ............... yekemîn ..................sê.......
**2**-Hevalnavên di hevokên jêr de diyar bikin.
-Yekemîn amadekarî, li xwe kirina cilên taybet yên heyvê bûn.
-Hemû televizyonan, ev çaxê dîrokî nîşan dida.
**3**-Dijpeyva peyvên li jêr bibînin û bidin naskirin.
**hêsanî- pêşî- daketin**
***Peyvên dijwate:*** *Ji wan peyvên wateyên wan dijî hev re,* ***peyvên dijwate*** *tê gotin.*
**Minak: Hişk: nerm**
**Sar : germ**
**4**-Cînavên di hevokên jêr de tarî hatine nivîsîn, cihê kîjan navan digirin?
-**Wî** di berçav re baş derbas kir.
-**Min** nivîsî, **te** xwend.
-**Wan** ew temaşe dikir.
**Cînavên kesî dibin dû beş:**
**Cînavên kesî yên ne tewandî:** Ez, tû, ew, em, hûn, ew
**Cînavên kesî yên tewandî**: Min, te,wî/wê, me, we, wan

## HÎNDARÎ

**1**-Mijara fîlmekî esmanî ku we temaşe kirî, bidin naskirin.

-Çûyîna mirov a li ser heyvê, roja piştî çûnê bi awayekî berfireh di rojnameyan de hatin nivîsîn. Bûyerên wek wî yên girîng bi riya çapemeniyê ji raya giştî re tê ragihandin.

-Nivîsa jêr a li ser "**çapemenî û rayagiştî**" ye, bixwînin û xalên jêr pêk bînin.

-Girîngiya çapemeniyê bidin diyarkirin.

-Têkiliya di navbera çapemeniyê û raya giştî de diyar bikin.

-Rêber APO di derbarê çapemeniyê de wiha dibêje**:** "**Çapemenî guh û zimanê gel e, ji cîhanê guhdarî dike û dide cîhanê**"

# SIBE CEJN E

Sibe cejn e nizanim dê çawa cejnê bikim,
Ez ê silava li kê bikim
Pîroznameya ji kê re rê bikim,
Goristanên me pir in
Nizanim taceguleke ji kîjanê re çêbikim
Ez ê çawa zarokên bê dayîk û bê bav hembêz bikim
Ez ê kîjan gaziyên bêdest, bêling û bêçav silav bikim
Gula dilê çilmisî vekim
Jê re şadiyekê çêbikim.
Ez ê kîjan hejar û belengazî bibînim
Yan kalemêr û pîrejina bêkes
Destan bigirim û ramûsim
Jê re kuraniyê bikim
Yan ez van hemûyan deyînim hêlekê
Dest biavêjim pênûsa xwendekarekê
Di wê da wê hêstirên çavên dayîkekê
Binivîsim pîroznameyekê
Pîrozname hêviya dilan
Rêbikim bû Rêberê mirovahiyan
Belkî kêliyekê vehês bike
Van êş û birîn û janan



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Hûn Qedrî can nas dikin?
2- dema Qedrî Can tê gotin kesayetek çawan tê ber çavê we?
3- Hûn dizanin çima Qedrî Can derbasî Rojava bû?



# 27 XEWNA HIŞARIYÊ

Ax welato ax welato
Roja me zû lê hato
Bav û birayên me çawan in
Çima xeber jê nehatin

Îşev min dît xewneke bitirs
Tû kerem bike ji min bipirs
Ez carekê rast pê bikim
Da tu bibînî çiqas bi hêrs

Bayekî reş hate ji jor
Li ser min kire borebor
Ber bigirî da kaxeza sor
Di nav hebûn dû tayên por

Ez çûme cem pîreke zeman
Min got:felekê vekî eman
Min daye der ev rih û can
Derdê min re bibe derman

Pîrê bo min rabû ser xwe
Piyana avê danî ber xwe
Li avê xwend li min nêrî
Dîsa serê xwe da ber xwe

Kaxez bi xwîna bira bû
Her dû ta porên xuhan bû
Mena wan kûr û giran bû
Ji fala pîrê nihan bû

Birayên me têne kuştin
Xwînên xwe têne şûştin
Xuhan porên xwe şûştine
Yanî çima hûn rûniştine




Îro laşim pir dêşe
Qenç bizanin jî dêşe
Lê çi bikim derman nîn e
Ta lê tine bextêreş e

Derman ku ez kifş bikim
Bêhêvîna xwe geş bikim
Ji dilbirînên wek xwe re
Pelên Hewarê reş bikim

Qedrî bibêj û binal e
Şînê girêde bikal e
Namus nema, rûmet nema
Ev çi derd e ev çi hal e

***Qedrî CAN***



## Wateyên Peyvan

**Hêrs:**Tengbûna hundir, bêzar
**Ta**: Dav, mû
**Qenç:**Baş
**Bext:** Rewşeke ku hinek kes pê bawer in (şans)
**Piyan**: Tas
**Xuh:** Xwişk
**Mena:**Wate

## Em Têbigihin

1-Helbestvan di xewna xwe de çi dibîne?
2- Pîrê xewna helbestvan çawa şîrove dike?

## Destûrên Ziman


**1-**Malika yekem lêkolîn bikin, pîvan tê de hene yan na?
**2-**Di malika duyem û sêyem de qafiyê bibînin?
**Sê cûrên qafiyan emê bidin diyar kirin:**
**a-Qafiya lewaz (nîvqafiye)**
**b-Qafiya tam**
**c-Qafiya dewlemend**
***a- Qafiya lewaz**: Ji ahengiya tîpek dengdar ya li dawiya rêzikên helbestan tê dubare kirin re **qafiya lewaz** tê gotin.*
***b-Qafiya tam**: Ji ahengiya dû dengên li dawiya rêzikên helbestan tên dubare kirin re **qafiya tam** tê gotin.*
***c-Qafiya dewlemend**: Ahengiya dengan a li dawiya rêzikên helbestan ji sê tîpan pêk tê.*

## HÎNDARÎ

**1-**Helbestvan çima ji bo welat axînan dikişîne? Vekin.
**2-**Hûn jî bi hûnandî daxwaza xwe ya ji bo welat binîvîsin.
**3-**Kî bersiva helbestvan dide?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-Navê duyemîn yê heval Mazlûm çi ye?**
**2-Qada Berxwedana Mazlûm DOXAN kûderê bû?**
**3-Navê pirtûkxaneya serpiyan çima li heval Mazlûm hatiye kirin?**



# RÊHEVAL MAZLÛM DOXAN




Hevalê Mazlûm DOXAN, şehîdekî birûmet û di têkoşîna Rizgariya Netewî de bi nav û deng e. Navê xwe bi tîpên zêrîn di dîroka Partiya Karkerên Kurdistan'ê de kola ye.

Mazlûm DOXAN, sala 1955'an li bajarê Xarpêt, navçeya Qereqoçanê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ji dibistana seretayî heya zanîngehê bi pileyên herî baş qedandiye.

Sala 1970'yî hevalê Mazlûm cihê xwe di nava şoreşgerên çep de girt. Ji sala 1971'ê û pêve Rêber APO nas kir û cihê xwe li cem wî girt. Xebat û têkoşîna xwe ji bo doza Kurd û Kurdistanê bi kar anî. Di nava tevgerê de xwe li ser bîrdoziya sosyalîzmê kûr kir.

Hevalê Mazlûm DOXAN ji bo rêxistinkirin û tevgera gel xebatên eniyê bide rêvebirin, di sala 1979'an de, li navçeya Serêkaniyê, dema dixwest biçe bajarê Rihayê, di rê de, ji aliyê artêşa Tirk ve hat binçavkirin û ew birin girtîgeha Amedê.

12'ê Îlûna sala 1980'yî artêşa Tirk desthelatdarî xist destê xwe. Hatina artêşê bandorek mezin li ser hêzên şoreşgeran kir. Di girtîgehan de zordarî û çewisandinên mezin li ser girtiyan kirin. Bi taybet girtîgeha Amedê, ji ber ku şoreşgerên Kurd yên "PKK" tê de bûn, ji dojehê xirabtir bû. Mafên mirovahî û kesayetiyê di bin lingên artêşê de dihatin perçiqandin.

Li hemberî wan zordariyan hevalê Mazlûm DOXAN; bi dirûşmeya "**Berxwedan jiyan e**." Dest bi berxwedaniyê kir. Ji bo ku dengê berxwedanê bigihîne derve û bala cîhanê bikişîne ser Têkoşîna Rizgariya Netewî, di 21'ê Adara 1982'an li girtîgeha Amedê ya tîpa E de, Agirê Newrozê bi giyanê xwe pîroz kir.

Ev agir pêt bi pêt derbasî nav hemû zindan û gelê Kurd bû. Ji ber wê çendê navê hevalê Mazlûm bûye Kawayê hemdem.

## Wateyên Peyvan

**Şoreşgerên çep:** Kesên wekheviya civakê ji xwe re dikin armanc û dixebitin.
**Bîrdozî:** Îdeolojî, zanista raman
**Sosyalîzm:** Zanista civakî, bîrdoziya rakirina çînan û wekheviya di navbera mirovan de.
**Rêxistinkirin:** Li ser doz û armancekê, yekîtî û hevgirtina bi rêgezan hatî çêkirin.
**Tevger:** Bizav
**Enî:** Cephe
**Desthilatî:** Serdestî
**Çewisandin:** Zextlêkirin, tirsandin, tinekirin
**Dojeh:** Cehnem

## Em Têbigihin

**1** - Hevalê Mazlûm di navbera kîjan salan de jiyaye?
**2** – Bi çi rengî tevlî xebatên PKK'ê bû?
**3** - Çima di 21'ê Adarê de çalakî pêk anî?
**4** - Çalakiya giyanbaziya heval Mazlûm rê li ber çi vekir?
**5** - Çima em ji hevalê Mazlûm re dibêjin "Kawayê Hemdem?"

## Destûrên Ziman

**1**-Peyva "**çalakiyan**" ji ber ku nîşana "**an**" li ser hatiye zêdekirin, ji "yekê zêdetir" çalakî dide diyarkirin. Di mijarê de peyvên "**şoreşgeran**, **zordariyan**, **şehîdan** û **dirûşmeyan**" pirjimar in, bi awayê yekjimar di hevokê de bi kar bînin û li lênûsa xwe binivîsin.
**2-Kar di sê demên bingehîn de tê kirin.**
**Her sê dem ev in**:
**a-Dema niha**
**b-Dema bê (dahatû)**
**c-Dema borî**
**a-Dema niha:**Dema ku em tê de ne, kar tê kirin.
**b-Demê bê:**Ew karê ku hêj nehatî kirin, di dema pêş de bê kirine.
**c-Demê borî:**Ew karê ku ji beriya niha hatiye kirin û bi dawî bûye.

## HÎNDARÎ

**1**-Dirûşmeya "**Berxwedan jiyan e**." çi dide diyarkirin? Şîrove bikin.
**3**-12'ê Îlûn'a sala 1980'an çi bandor li ser gelê Kurd û Tirk kir? Lêkolîn

MIJARA SERBEST

## HEY PALE

Hey pale pale pale lo, hey pale pale pale
Dasa te keda jînê lo, hey pale pale pale
Rabe gurzan bihûne lo, hey pale pale pale
Hey pale pale pale lo, hey pale pale pale

Paleyê ji deşta Rojava lo, hey pale pale pale
Rahêje das û qaynaxan lo, hey pale pale pale
Roj hatiye ber ava lo, hey pale pale pale
Çaxê kar û bizavan lo, hey pale pale pale

Paleyê ji deşta Mêrdînê  lo, hey pale pale pale
Rabe, rahêje dasa xwe lo, hey pale pale pale
Berî germa havînê lo, hey pale pale pale
Karê te li paş nemîne lo, hey pale pale pale


***GELÊRÎ***



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Cihê Kurdistanê li ser nexşeya cîhanê bibînin.
2-Peyva “Mezopotamya” lêkolîn bikin.






# KURDISTAN


Kurdistan, cihê avabûna mirovahiyê ya herî kevn e. Di dîroka cîhanê de çend cihên mirovahiyê yên herî kevnare hene; Mezopotamya, Filîstîn, Misir û Yunanîstan hindek ji wan yên herî kevnare ne. Weke tê zanîn, Mezopotamya, ji xaka di navbera Dîjle û Firat'ê re tê gotin. Kurd ji Mezopotamyayê re dibêjin Mezra Botan. Heya van salên dawî arkolog û dîrokzanan digotin Misir û Filîstîn cihên mirovahiyê yên herî kevnare ne. Bes di van salên dawî de arkeolog li başûrê Kurdistanê nêzîkî çiyayê Zagrosê rastî şûnwarên gundê Çermo (nêzîkî deh hezar sal 10000) û şikefta Şanedar hatin. Li gor zanîn û agehdariya arkologan, di vê şkeftê de 60000 şêst hezar sal berî niha mirov lê jiyane.

Dîsa arkeologên Emerîkî, Elmanî û Tirk di sala 1985'an de li Amedê, li derdora Erxeniyê avahiyek ji bin xakê derxistin. Ev avahî dû ode û eywan in. Ji beriya 9000 sal hatiye avakirin. Vê, dîroka mirovahiyê ji binî ve guhert.

Li gorî pirtûkên dîrokê û dîrokzanan peyva Kurd, berî zayînê 2000 sal hatiye bikaranîn. Lê, ji ber ku dîroka Kurdistanê û gelê Kurd hertim ji aliyê biyaniyan ve hatiye nivîsandin, her yekê li gorî zimanê xwe bi kar aniye. Mîna Kardoxî, Kardaka, Kurtî, Kurdayê. Navê Kurd ji wateya gelê cihên bilind hatiye standin.







## Wateyên Peyvan

**Arkeolog:** Kesên lêgerînê li ser bermayên dîrokî dikin, kolyarnasî
**Şanîder:** Şkeftek li bakurê Hewlêr yê dîrokî ye.
**Şaristanî:** Medeniyet

## Em Têbigihin

**1**-Li gorî arkeolog û dîrokzanan, şaristaniyê ji kû derê dest pê kiriye?
**2**-Ji kû derê re dibêjin Mezopotamya?
**3**-Di şaristaniyetê de çi girîngiya Mezopotamya yê heye?
**4**-Di parçeyê de kîjan beşa dîroka me tê vekirin?

## Destûrên Ziman

**1**-Em lêkolîn bikîn ka hevokên li jêr ji bo kîjan demî hatine bikaranîn çima?
-Kurdistan, cihê avabûna şaristaniya herî **kevin bû**.
-Kurdistan cihê avabûna şaristaniya herî **kevn e.**
-Kurdistan wê bibe cihê şaristaniya herî **kevin**.
**2**-Hevokên li jêr binçîne bikin û demê karê wan diyar bikin.
**a-Azad nan xwaribû.**
**b-Bêrîvan wê biçe bêriyê.**
**c-Ez pirtûka refa pêncan(5) dinivîsim.**

## DAXWAZNAME

Pirtûkên ku em dixwazin bi dest bixin, bi nameyan ji pirtûkxaneyan tên standin. Em ji van nameyan re dibêjin daxwazname. Pêwist e, em di van nameyan de daxwazên xwe kurt û vekirî diyar bikin.

Nameyekê ji weşanxanê re rê kin û ji wê derê pirtûkekê bixwazin. Ji daxwaznameya li jêr sûd bigirin.

**Mînaka Daxwaznamê**

**21.04.2014**

**JI BO PIRTÛKXANEYA DIBISTANÊ**

***Ji bo ez betlaneya xwe ya salê binirxînim, ji pirtûkxaneya we pirtûka bi navê Xaltîka Zeyno dixwazim.***
***Ger hûn vê pirtûkê rêkin ez ê dilşad bibim.***

***Evîn Serdar / Kirmanşah***
***Semta Şaho /Taxa Şîrîn /Jimara malê /21 /Kolana Hêjar***

# NEWROZ



Newroze bihare cejna gelê me,
Gul vebûn bi xemgîn weke dilê min.
Vê dûrî em kuştin ey Serokê min,
Pîroz be cejna te pîrê dilê min.

Pîroz be, pîrozbe, pîroz be li te,
Zarokan gul kom kirin îro jibo te.
Didin kevokan dişînin jibo te,
Bila gul baxçe bin tev li dora te.

Newroz bê bihar bê reng dide gulan,
Tû dûrî êş dikeve hemû dilan.
Dilê xwe em rê dikîn şona silavan,
Pîroz be cejna te Seyîdayê dilan.

***Diyar Dêrsim***



## Wateyên Peyvan

**Mestim**: serxoş im
***Xemgîn:*** *xwedî xem*
***Dûrî:*** *Dûrbûna ji me*
***Pîr:***_Zanayên olî yên Elewî û Êzidiyan._
***Kevokan:***_Kotir_
***Êş:*** *Jan*
***Seyîda:***_Kesên waneyan didin_

## TEST 3

**1**-Biwêj çawa têgihandinê çêdikin?
**A**. Bi gotinên mecazî, gelek tiştan têdigihîne.
**B**. Naskirina kesên gotîn.
**C**. Mamik in.
**D**.Wekî peyvekê tê bikaranîn.
**2**-Peyva "**Zêr**" di kîjan hevokên jêr de, cuda hatiye bikaranîn?
**A**. Zêr heyberek e.
**B**. Zêrker zêran difiroşe.
**C**. Zêr zer e.
**D**. Huner zêr e.
**3**-"**Azad diçe dibistanê**." Di vê hevokê de, kar bi kîjan demê hatiye kişandin?
**A**. Dema niha
**B**. Dema borî
**C**. Dema bê
**D**. Demê boriya berdest
**4**-Ji bo ku em di derbarê "heyvê" de bibin xwedî agahî divê em li kîjan vebijêrkên jêr binêrin?
**A**. Li ferhengê
**B**. Li pirtûkên astronomiyê
**C**. Li pirtûka ziman
**D.** Li pirtûka ramanê
**5**-Kesê rêyekî ji derveyî civakê bigire, wê tenê bimîne. Bi vî rengî nikare bi hêsanî xwe biparêze. Di nav tirsnakê de dimîne.
Kurtebenda li jor wateya kîjan gotinên pêşiyan ên li jêr tînin ziman.
**A**. Dû cembaz li ser werîsekê nalîzin.
**B**.Yê dikeve deryayê, xwe bi mar digire.
**C**. Peza ji bira xwe veqete para gur e.
**D**. Serê du berana di beroşekê de nakele.
**6**-Di hevokên jêr de kîjan kar li gor dema borî hatiye kişandin?
**A**. Ez jî bi we re **têm**.
**B**. Hewar bi hevalên xwe re **çû**.
**C**. Gulopên kolanan **pê dikevin.**
**D**. Hevalê min wê **bê**.

7-Em ji kîjan hevokên jêr dizanin ku, karek wê li cihekî zêdetir bê kirin?
**A**. Duh hevalê min hat gel me.
**B**. Zarok jî helbestan dibêjin.
**C**. Li gundê me jî rê wê bê çêkirin.
**D**. Pirtûk dê pirtir bê xwendin.
**8**-Mirovên xebatkar her demê karên xwe bi serkeftî pêk tînin. Kireka vê hevokê kîjan peyv e?
**A**. Mirovên xebatkar
**B**. Karên xwe
**C**. Her demê
**D**. Pêk tînin
**9**-Kîjan peyva li jêr ne hevgirtî ye?
**A**. Masîro **B**. Gernas **C**. Newroz **D**. Teng

**10**-Peyva “**wî**” di kîjan hevokên jêr de, di rewşa cînav de hatiye bikaranîn?
**A**. Ez **wî** mirovî nas nakim.
**B**. Min gotina xwe bi **wî** neda pejirandin.
**C**. Duh ez çûm **wî** çiyayê han.
**D**. Min jî ji wê pirtûkê hez kir.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-We balinde kedî kirine?**
**2-Çûk di rikehê de xweştir e  yan azad be?**



# TOMIKÊ ÇÛKÊ

Ez li Bazîdê, di çayxaneya Dilxwaz de bûm. Di nav çayxanê de çavê min bi dayîkekê ket. Li rexa wê zarokek pênc şeş salî, di destê zarok de jî rikehek hebû. Dayîk, ji çaygêr re tiştnan dibêje; çûka di rikeha zarok de jî nîşa dida. Çaygêr gazî pîremêrê li ser rojnamê diponijî, kir.

-Tû mereqdarê çûkayî. Zerêleyeke erzan heye. Te divê? Dema pîremêr dengê çûkê bihîst çavên xwe vekir, zarok gazî cem xwe kir û rikeh jê wergirt, lê meyzand û got:

-Kêr nayê.

Dayîkê, bi meyzandineke xemgînî li pîremêr meyzand.

-Me nedifirot lê bernediket ku...

-Em hemû di heman rewşê de ne.

Çaygêr dît ku ez bi balkêşî li wan dimeyzînim, di ber min re derbas bû û got:

-Yezdan kesî nexîne. Zavayekî ciwanê yê vê dayîkê hebû. Li Zaxros şehîd ket. Sala derbasbûyîjî keça wê mir. Bi neviyê xwe re tenê maye.



Çûk nehat firotin. Dayîkê di bin çavên xwe yên tijî hêstir re li neviyê xwe dimeyzand û dixwest bi dilê xwe yê kul û keser lê bi lêvên xwe yên bi ken zarok şad dikir.

Wê demê min çaygêr êxist navberê û bi bihayê dayîkê xwestî rikehê bikirim. Dayîkê, pênc dirav ji pereyên min danîn ser mêze rakir û da zarok. Dema ez bi dayîkê re daxivîm, em neketin wê cudahiyê ku zarok demekî dirêj winda dibe. Ew bêhneke din di dest de, nanikê kuncîkirî û kîsik biçûk tê. Bi nîvê pereyê standî ji çûka xwe re tomik kiriye. Zarokî hinek tomik xist nav destê xwe û dirêjî rikehê kir. Çûkê nav şivikên rikehê re nikilê xwe dirêjî tomik kir.

Zarok dixwest maçeke xatirxwestinê li nikilê wê bide. Piştre bi çavên tijî histirên dibiriqin li rûyê min meyzand û hêvî kir.

-Bila ev tomik li rex we bimîne, hûn ê bidin wê, ma nabe?

Piştî min rikeh stand, min li wan vegerand.

-Kurê min, ez nikarim temaşeyî vê çûkê bikim. Ez ê wê ji te re bihêlim cardin tû lê bimeyzîne. Dema mezin bû, ez ê bistînim, ma nabe?

Dayîk vê rast nabîne.

-Çi girîngiya vê heye dayê?

-Bila ji zarok re yadîgariya min be. Lê bi mercê çi bibe bila bibe, hûn careke din neyînîn firotinê.

## Wateyên Peyvan

**Yadîgarî**: Diyarî
**Bazîd:** Navçeyeke Agiriyê
**Tomik**: Çînî
**Rikeh**: Cihê firindeyên kûvî dixinê.
**Kumik:** Qutiya çînî.

## Em Têbigihin

**1**-Dayîk û neviyê xwe bi kîjan armancê diçin çayxaneyê?
**2**-Firotina çûkê bandoreke çawa li dayîkê û neviyê wê dike?
**3**-Ji çi diyar dibe ku zarok ji çûkê hes dike?
**4**-Nivîskar, çima çûka kirî paş de vegerand?
**5**-We çi encam ji vê nivîsê derxist?

## Destûrên Ziman

**1-Kar;** Di hevokê de peyva kirin, bûyer, sazbûn, bizavê bi demê re diyar dike.
**Kar** di dema **borî**, **niha** û **bê** de tê kirin.
**2-Bazîd,** çima navekî taybet e?
**3**-Peyvên di hevokên jêr de tarî hatine nivîsîn yên bi kirina karê kirekê bandor bûyî kîjanin?
**Çûk** nehat firotin.
Dayîk **vê** rast nabîne.
Em ji van peyvan re dibêjîn pêkir.
**4**-Hevokekî saz bikin kar ji aliyê kesê duyem ê yekjimar ve bê kirin.
**5**-Hevokekî sazbikin  kar ji aliyê kesê sêyem ê pirjimar ve bê kirin.

## HÎNDARÎ

**1**-Hûn li gor serpêhatiyê, rêbaza alîkariya nivîskar ji bo nevî û dapîra wî çawa dinirxînin?
**2**-Ger nivîskar bi awayekî vekirî alîkarî bi dayîk û neviyê wê re bikira, wê bandoreke çawa li wan bikira? Di refê de goftûgo bikin.
**3**-Bazarekî hûn jê re bûyîn bîner vekin.
**4**-Li jêr destpêka serpêhatiyekî hatiye nivîsîn. Vê serpêhatiyê li gor daxwaza xwe bi dawî bînin. Tiştên we nivîsîn di refê de goftûgo bikin.

# GEŞTA ÇIYAYÎ

Dibistan li ber girtinê bûn. Mamoste got:

-Zarokno, hûn hemû jî îsal li ser waneyên xwe baş xebitîn. We geşt û şahî maf kir. Ez ê sibê we bibim çiya.

Zarokên di refê de, bikêfxweşî xwe avêtin hev.

Sibê zû li baxçeyê dibistanê kom bûn. Di destê hemûyan de xwarina wan hebû. Komik, komik li hev kom bûbûn û li ser geştê daxivîn. Mamoste got:

-Zarokno, pêwîst e hûn di vê geştê de destûran bi cih bînin. Di rê de rêz xirakirin tine ye. Hengê bilind derxin, henekên çewt kirin, ji rêzê derketin nîn e. Dema em gihîştin çiya belavbûna li derdor nîn e. Hûn ê nêzîkî min bilîzin. Hûn ê gelaşê xwe jî li cihekî kom bikin. Emê, niha bibin rêz û em bi rê bikevin.



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Şanoyekî balkêş we temaşe kiriye?
2-Li gel hevalên xwe kurte şano yekî çêbikin.

## BÎRHAT Û DILJÎN

Li pişt perdeya şanoyê, ji dûr ve çiya û malên gund; li nêzîk jî dehl û zevî dixweyîn.
Bîrhat û Diljîn, li pey balinda dibezin û tên dikê. Cil û bergên herêmî li wane. Ji bo balinda bidin firandin di destê wan de dar hebûn.
**DILJÎN:**
- (Westiyayî xwe davêjê erdê) Ooff! Bira, ez pir westiyame.
**BÎRHAT:**
– Ha! Tû westiyayî?
**DILJÎN**:– Tû xort î, tû dikarî newestî, lê, ez?...
**BÎRHAT:**– (Dikene) Baş e, em ê di şer de çawa bi ser bikevîn?
**DILJÎN:**
**–** Xort şer dikin.
**BÎRHAT:**
– Ma jin çi dikin?
**DILJÎN:**
– Kêliyan dike, xwarinê çêdike, derozan dikin.
**BÎRHAT:**
– (Here heneker) Dijmin jî winda dike. (Her diçû ji dil dibû) Va ji te re dijmin bigire; Balindeyan çav dane ser dexlê me, çav dane ser keda xalê min, karên dayîka min. Weke ewrekî reş yek tê xwar, yek radibe... Weke ez di bin nikilê wan de bim.

**DILJÎN:**
– Ez tênagihim, tû çima ewqas ji xwe re dikî xem.
**BÎRHAT:**
– Ji ber wan tiştan, ez dixwazim li hember rawestim, ji ber wê ez vê dikim. Li ser vê re jî ez nikarim bibim asteng.
**DILJÎN:**
**–** Êêê?
**BÎRHAT:**
– Ji min distînin, li min didin
**DILJÎN** :

– Sê ta genim, pênc lib ceh. Ma hemû tiştên dibin ne ev in?
**BÎRHAT:**
– Na, ne ev in. Min xwest ez, wan her sê tayên genim biparêzim lê min nikarî. Min xwest wan pênc libên ceh nedim lê birin. Ya girîng ev e.
**DILJÎN:**
– Oyy tû jî bira! Tu çiqas cuda dihizirî.
**BÎRHAT:**
– Hizirîneke cuda (ponijî) tû ne ya destpêkê yî ku vê dibêjî min. Tû dizanî, belkî ji vê yekê ez nikarim bi tu kesî re hevaltiyê bikim. Demek tên; yan ew xwe ji min dûr dixin an jî ez ji wan teng dibim. (Xwe dirêj dike û di bin serê xwe de destên xwe girê dide. Di rûyê esman de kûr dibe) Roj jî li esmanan tenê ye. Bi rastî stêrk jî hene lê di ronahiya wê de xuya nakin. Ka carekê bihizire, ev çi ronahî ye!..
**DILJÎN:**
– Rast e, gelek ronahî ye.
**BÎRHAT** :
– Bavê min digot; "Ya ronahiyê dide stêrkan jî roj e… Çi ji rojê bistînin wê didin, çiqas bistînin wê qasê didin..." Min dixwest ez bibim roj.
**DILJÎN:**
– Ez bawer dikim tû bûbûya roj, te nedixwest pêt bi pêt bişewitiya.
**BÎRHAT:**
– Ji bo ez pêt bi pêt bişewitim dixwazim bibim roj. (Guliyekê jê dike) Lê binêre! Ev gulî wê tijî bibe, zer bibe; biçe? Bi rojê. (Kêzikek ya bi navê meqesok ji axê radike) Lê binêre, ev kurmika meqesok hêjî di xew de ye. Ji bo ew ji xewa dirêj ya zivistanê şiyar bibe, li bendê ye ku ez hinekê baş germ

bikim. Lê binêre, wê dara han bi min re pelçim da.

**DILJÎN:**

– Rast e, lê ez ji bo çûkan, ji bo daran, ji bo kêzikan xwe naşewitînim.

**BÎRHAT:**

– Ger karê te şewitîn be, tû yê bişewitî.

## Wateyên Peyvan

**Kêlî:** Dirûtin
**Pûnijî:** Hizirandin. Di xew re çûyîn.
**Gulî:** Wêşî, simbil
**Balinde**: Firinde
**Meqesok:** Zindiyekî piranî di demsala bihara de tê dîtin.

## Em Têbigihin

**1**-Çima Bîrhat bi hinek kesan re nikare hevaltiyê bike?
**2**-Bîrhat di derbarê rojê de çi dide têgihandin?
**3**-Em ji van nivîsînên wiha re çi dibêjîn?

## Destûrên Ziman

Ew peyvên ku cihê navan digirin, ji wan re **Cînav** tê gotin.
Cînav; weke navan bi pêvekên yekjimar û pirjimar tên herikandin.

| **Cînavên:** | **yekjimar** | **pirjimar** |
|---|---|---|
| | **Ez - min** | **Em - me** |
| | **Tû - te** | **Hûn - we** |
| | **Ew - wî/wê** | **Ew - wan** |

## HÎNDARÎ

**1**-Tiştên di parçeya we xwendî de hatine têgihandin, bi kurtî li gor destûrên nivîsîna hûn fêrbûne binivîsin.
**2**-Bûyerên filmekî zarokan ku we temaşe kiriye bi rêzê ve binivîsin.
**3**-Rêveberiya dibistanê, ji refa 5’an re spasnameya li jêr rê kiriye. Ji vê sûd bigirin û hûn jî spasnameyekê binivîsin.

*We di çarê Nîsanê de serkeftinek mezin bi dest xist.*
*Ez ji we re spas dikim, berdewamiya serkeftinên we dixwazim.*
**Rêveberiya dibistanê**
**Nav û wajo**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Hûn jî li ser şehidan helbestekê bihûnin.
2- hevalek yê berê we naskirî û şehîd ketî heye, ger hebe kesek çawa bû?
3- Hestên xwe lî ser şehîdekî vebêje.

# ŞEHÎD

*Cîhan tarî roj bû reşî,*
*Gul çilmisî vîn bû heşî.*
*Kevokek hat nû bû xweşî,*
*Heval bizane ewe şehîd.*

*Av ne mabû li ti cîhan,*
*Her der bibû kelha xeman.*
*Ronî derket da her deran,*
*Heval bizane ewe şehîd.*

*Hirç û hov û tev gurên har,*
*Li mirovan bûne neyar.*
*Li hember wan roj hate xwar,*
*Heval bizan ewe şehîd.*

*Hemû der tev bibû zîndan,*
*Yekî çekdar lê çand bostan.*
*Li cem Xûdê bûye mêvan,*
*Heval bizan ewe şehîd.*

*Şehîdên me bi hezarn,*
*Dikevin her cih û waran.*
*Bi yek ser diçin esmanan,*
*Heval bizan ewe şehîd.*



*M. Mela Şirîn Çetîn*

## Wateyên Peyvan

**Heşî:** şîn û xem
**Waran: Cihê mirov lê bi cih dibe**
**Neyar: ne viyan, ne heskirî, dijmin**
**Gur: Lawirek durinde**
**Hirç: tebayeke di herêmên çiyayî de dijî, bi hinek tevgerên xwe weke mirove.**

## Em Têbigihin

**1**-Hûn ji rêza “cîhan tarî roj bû reşî” çi tê digihin?
**2**-Malika duyem ya helbestê vekin.
**3**-Dema tê gotin “Li cem Xûdê bûye mêvan.” Kesek çawa tê bîra we?

## Destûrên Ziman

**1**-Hûn dizanîn pêveka "**î**" ya di dawiya malika destpêkê de redîf e.
**Redîf:** Ji wan peyv yan, pêvekên wekheviyên li dawiya rêzikan di heman erkî de tên dubare kirin û piştî qafiyan tên jê re **redîf** tê gotin.
**2**-Hemwateya peyva “**Şehîd**” bibînin.

## HÎNDARÎ

**1**-Nexşeya Kurdistanê çêbikin.
**2**-Nivîsandina li jêr bixwînin û diyar bikin ka ji ber çi gerilatî karekî pîroz e?

***Hêza Parastina Gel***

**Karê parastinê, karekî pîroz e. Xaka welat li hemberî dijmin, bi berxwedana gêrila tê parastin. Welatê me û gelê me li hemberî tirsnakê, bêyî ku çavên xwe bineqînin, dikarin mergê xwe bidin.**
**Ji bo parastina gel, bi hezaran keç û xortan mil bi mil şer kirin û şehîd ketin. Di ber azadiya gelê xwe de car bûn narîncok, carnan jî bûn kevokên aştiyê. Ya girîng, li pêşberî pêvajoyê bersiva herî di cih de dan.**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Hûn çend cûrên daran nas dikin, ji hevalên xwe re bidin naskirin.
2-Zarokno di derbarê temenê dara çinarekê de lêkolîn bikin.



# DARA ÇINARÊ

Ev çi hest e, hûn dizanin? Serê xwe serbest bi şanazî ber bi esmanan ve bilind kiriye. Çiqên xwe bi hezkirin, her yekê bo bîranîna dîroka civakekê, bi sedan sal dirêjî xwezayê kirine. Dema min ev darên çinarê dîtin, mûyên min qij bûn. Ez bi xurûş di kûrahiya dîroka xwezayê de çûm. Ez nêzîk bûm, min destê xwe avêt gewdê yek ji wan ê mezin, bi hezkirineke mezin, çavên min li bilindî û stûrbûna wê geriya. Ez hizirîm û min got: “Xwezî zimanê wê hebûya, jîna xwe ya berî sedan sal û pê de ji min re bigota, çend civakên cuda cuda li bin sîbera wê rûniştine, rojên şîn û şahî derbas kirine.”

Ev çinarên dîrokî di Geliyê Qiyametê de ne. “Geliyê Qiyametê”, bi kaniyên xwe yên zelal û şîrîn, damiyên xwe yên cûr be cûr yê rengîn, bi pêlên robarên xwe yên spî û zelal û bi tevaya xwe ya xwezayê rengê bihuştê dide. Lê serpêhatî û çîrokên pêşiyan dibêjin di vî gelî de, ji beriya Konferderasyona Medan, di serdema desthilatdariya Asûriyan de, di navbera Medan û Asûriyan de şereki mezin çêbûye. Ev gelî hemû bi xwînê hatiye avdan, bê jimar kuştî çêbûne. Bi vê boneyê navê wî bû Geliyê Qiyametê.

Çinarên di vî gelî de, bi sedên salan heya niha dijîn. Malûvanî, ji gelek çandên cuda re kiriye. Lewra gelek niviskên Zerdeştiyan yên ji beriya zayînê li gelî dixuyîn. Bermayên Asûriyan, Ereban û Kurdan tê de diyar dibin. Çinara herî bilind 15 metre ye. Yek ji van çinaran kun bûbû. Di nava qurmê wê de 10 kes bi sanahî dirûniştin.

Ev parçe xwezaya dîrokî ya jê re dibêjin “Geliyê Qiyametê”, dikeve Başûrê Kurdistanê, devera Etrûş a girêdayî Dihokê. Lê mixabin, ji ber ku welat bindest e, ev devera dîrokî û çinarên temenê wan heya hezarên salan diçin bê parastin mane.



## Wateyên Peyvan

**Şanazî:** Serbilindî
**Nivisk:** Cihê miriyên Zerdeştiyan yên nûnerên olî.
**Damî**: Darên xwezayî şînbûne.
**Sîber:** Sih, sî

## Em Têbigihin

**1**-Nivîskar li ber dara çinarê çima bi xurûş radiweste?
**2**- Ev dar li derên cuda dijî yan na?
**3**-Ev dar li kûderê dijî?
**4**-Geliyê Qiyametê navê xwe ji çi standiye?
**5**-Dara çinarê, dareke çawa ye?

## Destûrên Ziman

**1**-Hevoka "Ev çinarên dîrokî li Geliyê Qiyametê ne" lêkolîn bikin ka wateyeke temam dide yan na?
**Hevok:** *Ji wan birepeyvên bûyerekê, hest, daxwaz û nûçeyekê didin temamkirin re **hevok** tê gotin.*
Hevok li gor sazûmaniya xwe dibin dû beş:
**a-Hevoka karî**
**b-Hevoka navdêrî**
**a-Hevokên karî:** Ew hevokên ku karekê didin diyarkirin.
**Mînak:**
***Darvan dar çandin.***
**b-Hevokên Navdêrî:** Ew hevokên ku rewşekê didin diyarkirin.
**Mînak:**
***Dara dibistana me ciwan e.***
**2**-Cihên vala yên hevokên li jêr li gor wateya wan dagirin.
a- Pirtûka min...........
b-Mamoste............dide.
c-.......çinarê 15..........

## HÎNDARÎ

1- Ger dara çinarê biaxive, hûn dixwazin çi tiştan jê bipirsin?
**2**-Li jêr sûdên daristanan hatiye diyarkirin. Van lêkolîn bikin:
-Li ser nîrê hewayê bibandor e.
-Hevsengiya xwezayî çêdike.
-Pêşkefitna aborî çêdike.
-Nahêlin hezînên axê çêbibin.
-Baranan rêkûpek dikin.
-Bi belavkirina oksîjenê, hewaya paqij didin.
-Bi dîmenên xwe welatê me xweşik dikin.
-Gelek amûr jê tên çêkirin.
-Parastina daristanên me, karê me yê sereke ye.
**3**-Hûn jî li ser daristan û cihekî dîrokî nivîsekê binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1-**Li derdora we kûçikên çawa hene, hûn çawa nêzîkî van kûçikan dibin?
2- Gelo hûn lawirên li derdora xwe diparêzin?
3- Hûn di zanin gelek taybetmendiyên mirov û lawiran wek hevin.



# QERO

Zarokan, dema ew di baxçeyê dibistanê de dîtin tirsiyan.
Bi laşê xwe yê girs ji hemû kûçikan cudatir bû. Guhên wî birîbûn. Bi rengê xwe yê reş dîtineke balkêş dida.
Zarok hêdî hêdi nêzîkî wî bûn. Ji selika xwe hinek parçeyên nan, kade û kutilk avêtin jê re. Tevayî roja kûçikê li ser axa zuha û hişk nivistî dest bi zindîbûnê kir. Kutilk û nanên dihatin avêtin bi hewa re digirt û dixwar.
Sarbûna di navbera kûçik û zarokan de, bi vî awayî rabû. Di demek kurt de, di nav wan de hevaltî û dostanî çêbû. Êdi kûçik di demjimêrên destpêkê yên rojê de, dihat dibistanê. Piştî zarok diçûn malên xwe, hêdî hêdî ji dibistanê diçû.

Rojekê li dibistanê agahî belav bû. Li gorî agahiyê, dibêjin şaredarî kûçikên beredayî kom dike. Di pêşî de kes nehizirî ku Qero serberedayî ye.

Dema dengê karmendên şaredariyê yên ku teba kom dikirin, li derdora dibistanê belav bû, her ku çû rewş girîng bû.
Hevalê herî nêzîkî Qero, Welat got**:**
-Were, xebatkarên şaredariyê kûçikan kom dikin. Em ê te di gova vala de veşêrin.





Piştî zarokan Qero kirin di gova vala de derî girtin. Êdî dilê hemûyan aram bû. Vê rewşê hinek dom kir. Yên Qero li wê derê veşartin, her bêhnekê deriyê wî vedikirin, xwarin û vexwarina wî didanê.

Di rojeke bêdengiya ezmûnê de, car din deng hat bihîstin. Zarokan serê xwe ji ser kaxezan rakirin û li hevdu meyzandin. Meyzandinên wan herî zêde li ser Welat kûr bûn.

Qero di govê de bû. Lewra Welat ji beriya ezmûnê karê xwarindayîna Qero pêk anîbû. Hevalê xwe yê di refeke din de, di demê ezmûnê de bi qasî hevalê wî bibihîze got**:** Ev gotina wî weke telefonê “di govê de ye”. “Di govê de ye…” Belavî refê bû.

Her çendî wiha hatibû gotin jî, zarokên ji ezmûnê derdiketin li Qero digeriyan. Derê govê vekirî bû. Qero tine bû.

Ji wê rojê û şûn ve, tu kesî Qero nedît. Lê, kesî Qero ji bîr nekir. Man li bendê ku wê rojekê li wan vegere.

## Wateyên Peyvan

**Niyaz:** Niyet
**Ezmûn:** Taqî
**Kade:** Nanê patîle, nanê gelek cûrên xwarin dikevin nav.
**Gov:** Cihê pez.

## Em Têbigihin

**1**-Di serpêhatiyê de, Qero kûçikekî çawa ye?
**2**-Zarokan, ji bo hevaltiya Qero çi kirin?
**3**-Zarokan, çima pêwistî bi parastina Qero dîtin?
**4**-Di beşa encam ya serpêhatiyê de çi tê têgihandin?
**5**-Sojeya vê serpêhatiyê derxînin.

## Destûrên Ziman

**1**-Hûn fêr bûbûn endamên bingehîn ên hevokê kar e, lê di hevoka navdêrî de endamê bingehîn salox e.
Di hevokên navdêrî de ji peyva hatiye saloxdan re **destpêk** tê gotin.
Ji peyva ku rewşa destpêkê radigihine re **salox (pêveber)** tê gotin.
Her dem bi saloxê ve pêvekên kesan yan jî kara bûnê ya alîkar heye.
**Mînak:** **Fereşîn** **zozanekî xweş e**.
Destpêk Salox (pêveber)
**2-**Endamê hevokên jêr diyar bikin.
**a-**Agirî çiyayê herî bilind e.
**b-**Dar dirêj bûn.

## HÎNDARÎ

**1**-We di serpêhatiyê de jî dît ku kûçikên serberedayî ji aliyê şaredariyê ve tên komkirin. Hûn vê yekê rast dibînin?
**2**-Pêwîst e, hûn ji bo lawirên serberedayî çi bikin? Ji şaredariyê re daxwaznameyekê ku hûn tê de, li ser vê mijarê ramanên xwe diyar dikin binivîsin.
Dema hûn daxwaznameya xwe dinivîsin mercên li jêr pêk bînin:
-Li jor, goşeya rastê dîrokê binivîsin.
-Li nîva jorê kaxeza xwe navê cihê hûn jê re bi rê dikin binivîsin.
-Tiştên hûn dixwazin diyar bikin kurt û vekirî binivîsin.
-Li dawiya daxwaznameya xwe cih bidin gotinên rêzdariyê.
-Li goşeya rast a jêr nav û paşnavê xwe binivîsin. Wajoya xwe lê zêde bikin.
-Li valahiya çepê ya jêr navnîşana xwe binivîsin.
-Tiştên we nivîsî cardin bixwînin û bi rêkûpêk bikin.
-Daxwaznameya xwe bi pênûsa hibir û li ser kaxezeke bêxêzik binivîsin.
-Dema hûn daxwaznameya xwe dinivîsin ji mînaka jêr sûdê bigirin.

**JI BO SEROKA ŞAREDARIYA DÊRSIMÊ**

Ez di taxa Seyîd Riza de nîştecî me. Rêyên di vê taxê re derbas dibin nehatine qîr kirin. Ji ber vê yekê toza trampêl radikin bandorê li ser tendirustiya me dike.

Bi rêzdarî hêviya qîrkirina riyên taxa me dikim.

**Demhat Têkoşer**
**wajo**

**Navnîşan:**
**Taxa Seyîd Riza**
**Hejmar 169**
**DERSIM**
**11.05.2000**

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Hûn çawa ji pirtûkan sûd digirin?
2-Hûn qet diçin pirtûkxanê.
3- Di pirtûkxanê de pirtûkên Rêber Apo bala we kêşa ye?
4- Pirtûka herî zêde hûn jê hes dikin kîjane?



# PIRTÛK

Pirtûka, hûn dixwazin bixwînin, baş hilbijêrin. Divê mirov pirtûkên jê sûd digirin, pirtûkên naveroka wê dewlemend hilbijêrin. Pirtûk jî wek hevalên mirov in. Dema mirov bi hevalê xirab re hevaltî bike, bêguman mirov dikeve riyeke şaş. Dema mirov bi hevalên qenc re hevaltî bike, mirov dibin xwedî hoy û taybetmediyên baş.

Cîhana pirtûkan pir mezin e. Mirov bi pirtûkan dinyayê dinase. Cihên herî dûr tînin ber mirov. Bi pirtûkan cîhana mirov berfireh dibe. Di dinyayê de mirovên herî navdar, zanyarên bijarte bêguman bi xwendina pirtûkan bi ser ketine. Mixabin pirtûkên ziyanê bide mirov jî hene. Naveroka van pirtûkan lawaz e. Tiştên ku mirov jê hîn bibin kêm in. Divê ji van pirtûkan xwe dûr bixin. Bi diravên xwe pirtûkên wisa nestînin. Dema mirov pirtûkan bistînin ji bo ku em nekevin şaşiyê, divê em ji mezinan û ji zanayan alîkarî bigirin. Çi pirtûkên ku em dibînin divê nestînin.
Em ji bîr nekin ku xwendina pirtûkan ji bo fêrbûn û pêşketina mirovan e.



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1-Dayîk ji bo we çi ye?
2-Çima herî zêde mirov ji dayîka xwe hes dike?
3- Gelo mirov dikare bêje welat dayîka herî mezine?



# DAYÎK



Heft salan û neh mehan,
Bê axîn û rawestan,
Ez parastim ji belan,
Ez xwedî kirim dayê,

Dema min kir nalenal,
Tu dayîka pir delal,
Dida min şîrê zelal,
Çawa maf bidim, dayê,

Rêveçûn nîşa min kir,
Axaftin bi min fêr kir,
Di ber min de xwe kal kir,
Bo te çi bikim? Dayê,

Bo fêrbûna jiyanê ,
Bi maç û hezkirinê,
Şad bûm li dibistanê,
Roniya min î dayê,

Navê te pir şîrîn e,
Gotinek bi evîn e,
Ji min re vîn û jîn e,
Min tû hes kirî dayê.

***Penaber***

## Wateyên Peyvan

**Kal:** Pîr

## Em Têbigihin

**1**-Di salên zarokatiya nivîskarî de, dayîka wî jê re çi kiriye?
**2**-Nivîskar bi gotina "Çawa maf bidim, dayê." dixwaze çi bide têgihandin?
**3**-Nivîskar li dawiya hemû malikan çawa hestên xwe di derbarê dayîka xwe tîne ziman.

## Destûrên Ziman

**1**-Malikên helbestê ji çar rêzikan pêk tên. Sê rêzikên pêşiyê ahengên wan yek in, rêzika dawî bi ahengeke cuda hatiye nivîsandin. Lê ahengiya rêzika dawî di hemû malikan de wekhev e. Ji vê destûrê re **qulf** tê gotin.
**2**-Qulfa di malika jêr de bibînin û binê wê xêz bidin.
"Mamosteyê herî mezin
Raman li min kir serûbin
Ramanê nû afirandin
Ji kû ve tê ev bawerî?"
**3**-Di helbesta we xwendî de, malika çendê xwedî redîf e, diyar bikin.

## HÎNDARÎ

**1**-Çima pêwîst e mirov li hemberî dayîkê rêzdar be?
**2**-Li ser heskirina dayîkê helbestekê bihûnin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

**1**-Kesên we naskirî û şehîd bûne hene?
**2**-Hûn ji bîranîna çi sûd digirin?



# BÎRANÎNA ŞEHÎD

Di sala 1994'ê de, li herêma Botan, devera Besta hêzên dijmin derdikevin operasyoneke mezin û berfireh. Di vê navberê de baskê dibin serkêşiya hevalê Hemîd de jî, ji devera Garisan, ber bi Besta ve tên û dikeve kemîna dijmin. Şerekî dijwar tê destpêkirin û şer dirêj dibe. Dijmin bi hemû cûrên teknîkên şer, şer germ dike. Di vî şerî de, di gel ku şer di rojê de ye, teknîka dijmin zêde ye, dîsa dijmin windahiyên mezin dide. Lê mixabin, di vî şerî de hindek windahiyên gerîla jî çêdibin. Heval Hemîd jî bi giranî birîndar dibe. Di encama vî şerî de heval xwe paşve dikişînin.

Heval Hemîd di gel birîndariya giran, ji bo ku gêwilê hevalên xwe nexweş neke, wan bi xwe ve gîro neke; parastî ji kemînê rizgar bibin, xwe veşart. Heval Hemîd di binê qaçekê de xwe diparêze, ta ku dibe spêde, dijmin li derdora wî xuya dike û ew bi hedareke mezin  xwe radigire û li ber xwe dide, di heman demê de bi awirên çavan dijmin dişopîne.



Piştî roj bilind dibe, dijmin li derdor baş digere û êdî qadê berdide. Heta ku heval Hemîd dizane, kesek ji dijmin li devera ew lê dimîne nema. Wê demê heval Hemîd bi zikxişkê ji binê darê derdikeve, bêhnek dirêj distîne û li derdora xwe dinêre. Daristaneke mezin, bêkes, ne dost û ne dijmin, kes li dora wî tine bû.

Birîna heval Hemîd ji ranê stûr e lê mejî û hişê wî di cih de ye, bes gelek xwîn diçe û ti derfetên dermankirinê di destê wî de nîn in. Piştî dizane dijmin baş dûr ket, dike qîr! Gazî hevalên xwe dike lê mixabin, ti bersivê nastîne. Bê xwarin û vexwarin, bê dermankirin, çar şev û çar rojan, li daristanê bêkes dimîne. Piştî hêviyê wî yên jiyanê namînin û dizane vê carê wê pakrewan bibe; di wê demê de xiyal û bîranînên hûr û gir gelek tiştên bi serê wî re derbas dibin û di encam de dest davêje teyîba xwe, ji berîka xwe derdixe, bandeke nû dide ser û li ser rewşa xwe û doza xwe, bi dengekî xweş bi dilekî kul dilorîne. Piştî wê hêdî hêdî ji hêz dikeve. Rêz û silavên xwe ji Rêbertî, partî û hevalên xwe re dişîne**:** “Ez diçim. Min li dûv xwe sê zarokên biçûk hiştin. Ew zarokên partiyê ne. Hêviya min ew e partî li wan xwedî derkeve.”

Di nav gotinên mîna “Bijî Serok APO! Bijî PKK!” dengê wî tê birîn û banda vala dizivire. Rêheval Hemîd tevlî karwanê nemiran dibe.

## Wateyên Peyvan

**Qaç:** Navê darekê ye ku herdem şîn e.
**Pakrewan:** Şehîd
**Gîro:** Mijûlkirin

## Em Têbigihin

**1**-Bûyera di mijarê de hatî têgihandin li kû derê û çawa çêbûye?
**2**-Hevalê Hemîd çima xwe ji hevalên xwe vedişêre?
**3**-Hevalê Hemîd dema dizane wê dawî li jiyana wî bê çi diyar dike?

## Destûrên Ziman

**1**-Endamên hevoka li jêr diyar bikin.
-Heval Hemîd di binê qaçê de xwe diparêze.
**2**-Çima tîpa "**î**" li pêşiya tîpa "**y**" cihê xwe bi tîpa "**i**" diguherîne?
-Ji ber ku tîpa "**y**" bi xwe xwediyê nîv dengdêr e.
**3**-Cudahiya her dû hevokên li jêr bibînin.
a-Ez pîrtûkê dixwînim.
b-Ez pirtûkê naxwînim.

## HÎNDARÎ

**1**-Bi alîkariya nivîsê, şêweya berxwedana Heval Hemîd vekin.
**2**-Hûn jî bîranînekê li ser şehîdan binivîsin.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

We bi tenê guhdarî li lawirên daristanê kirine, dengên wan çawan in?

# HIŞT HIŞT

Min bizinek boz dît. Dengek hat:

-Hişt!

Ez vegeriyam û min lê meyzand. Diriyekê bistiriyên xwe li min meyzand. Di rê de ti kes tine bû. Min li serbanê malekê, ji dûr ve du çûkên difirin, di nav pelçiman de dîtin. Dema min li ser riya xwe domand, yekî got:

-Hişt hişt!

Min xwest vegerim lê binêrim. Belkî ji ber zêde xwestina min, min nekarî ez lê binêrim. Dibe ku çûkekê li ezmanan kiribe hişt hişt û derbas bûbe. Li paş min marek, kîsoyek, jîjoyek derbas bibin. Belkî kêzekê gotibe hişt hişt!

Car din yekî got:

-Hişt!

Vê carê jî dibe ku min ji ne xwestinê lê ne meyzandibe; weke yek di nav deviyan de xwe veşartibe.

Ez li rex rê rûniştim. Hindekî ji min wê de kerekî boz diçêriya, çirt çirt giya dixwar. Dibe ku ev çirt çirta wî li ber guhê min bûbe hişt hişt! Dengekî ji dengê çêrîna ker cudatir got:

-Hişt, hişt, hişt!

Zilamekî erd dikola,

Ji min re got:

-Silav li ser te be hemşeriyê min.

Min jî bersiv da.

-Ooo! Silav li ser we jî be!

Cardin li ser karê xwe mijûl bû. Min got:



-Hişt, hişt! Lê, ji xwe re nekir xem. Carek din min got:
-Hişt hişt! Dîsa li min nemeyzand. Min bi lez û li ser hev got
-Hişt, hişt, hişt! Got:
-Kerem ke camêr.
Min got:
-Min tiştek negotiye.
Tiliya xwe ya biçûk kir di guhê xwe de û xwirand. Cardin min got:
-Hişt, hişt!
Berê xwe da esmanan. Li çûkan meyzand. Li palê meyzand. Piştre bi guman li min meyzand.
Ji bo ez gumanên wî belav bikim min got:
-Îsal kixsên te çawan in? Got:
-Hêj jî pê divê.
Weke bêhnê bikêşim min got:
-Hişt!
Cardin bi guman li palê, li esmana bi guman li min meyzand. Min got:
-Dibe ku çûk bin. Got:
-Hişt hiştek tê guhê min jî lê ji kîjan alî ve tê? Ji xwe di wê demê de guhên min giran bûn. Dema ez hinekî dûr ketim, cardin ew deng hate min.
Vê carê min girt. Rezvan bû. Ew bû.  Min got:
-Dê dê, vê carê min tû girtî.
Wî got:
-Na, bi Yezdan, hêjî min xesên xwe nebirîne. Ma ne bi pereyê xwe ye, ez ê çima ji te veşêrim.
-Ma ne tû yî dibêjî hişt hişt?
-Ez jî dengekî dibihîsim. Lê min nezanî ka ji kûderê tê?
Ji mirovan, ji lawiran, ji giyan, ji kulîlkan, ji ku bê bila bê... Dengê hişt hişt, neyê ne baş e.
-Hişt hişt!
-Hişt hişt!
-Hişt hişt!

## Wateyên Peyvan

**Dirî:** **dirî,** Stirî
**Boz:** Têkela spî û reş

## Em Têbigihin

**1**-Nivîskar di xwezayê de kîjan şînatî û lawir dîtine?
**2**-Nivîskar, çi tişt ji zilam re got?
**3**-Encama we ji vê miajrê derxistî binivîsin?

## Destûrên Ziman

**1**-Peyvên “hişt hişt” ên di hevoka "Yekî li pey min digot:hişt hişt." bire peyvên dubare ne.
**Birepeyvên dubare**: Ew birepeyvên hevdengên bêyî ku ti hêmayan bistîne û li pey hev tên dubarekirin jê re dibêjîn **birepeyvên dubare**.
-Bizanin birepeyvên dubare bi hev ve nayên nivîsandin.
**Mînak:** ***Çir çira kerê boz bû.***
**2**-Hûn jî dû hevokênbire peyvên dubare tê de heyî saz bikin.

## HÎNDARÎ

1-Devereke xweş ya welatê xwe bidin naskirin.
2- Navê çend lawirên kûvî binivîsin.

## MIJARA SERBEST

# XWEZAYA WELATÊ ME

Welatê me,gelek bi xêr û bêre. Li welatê me, gelek darên rengîn, giyayên bi sûd û gulên bêhn xweş têne dîtin.Her wiha li xwezaya welatê me, perstgehên pîroz jî bala mirovan dikêşînin.

Dema tû derbasî çiyayên Kurdistanê dibî, hebûna darên; behîv, gûz, hinar, hirmî,mêw, hejîr, bîh,xox, mijmij, sêv, fistiq, kezwan, berû û gezûyê bala mirovan dikêşîne. Lê dema tû derbasî zozanan dîbî;rêvas, kereng, Siyabo,lûşik, soryaz, kivarik, sîrik,bîk,karî, çi û ne çi! Bi sedan giyayên jibo tenduristiyê tên bi karanîn hene. Ji xwe gera di nava vî giyayî de, mirovan bi coş dike. Dema tû derasî newalên welatê me dibî, bêhna gul, şîlan, nêrgîz, beybûn, sosin û endekoyan mirovan serxweş dikin. Di gel vê bêhna xweş, bi xwendina çûk û firindeyan awazek xweş tevlî jiyanê dibe. Li aliyê din dengê hok hoka şivan û lorînên bêrîvana jî, rengek cudatir dide vê xwezayê. Perestgehên weke, cihê keştiya Nûh( Cûdî) perestgeha Xirab Reşkê, Dêra Extemarê, Laleş, Gola Îbrahîm Xelîl û h.w.d, di welatê me de weke cihên pîroz seredana wan tê kirin

Ev xwezaya ev qas ciwan, ew xwezaye kû bi dehên salane, bi xwîna pakrewanan tê avdan û bûye hêlîna evînê.



## TEST4

**1**-Bêyî em biçin pirtûkxaneyekê me dikarî bi kîjan nivîsandinê pirtûkan bixwazin?
**A**-Daxwazname **B**- vexwedname
**C**- Rapor **D**-Name
**2**-"Dema ku dît kar ber bi nebaşiyê ve diçe, ji wê derê dûr ket." wateya peyva "**dît**" di vê hevokê de bi çi awayî tê ravekirin?
**A**-Nirxandin **B**- Têgihiştin
**C**- Dîtina bi çav **D**- Şopandin.
**3**-Kîjan gotina mezinan yên li jêr di wateya xwe de nêzîkî wateya gotina "**Karkerê xwe be xweştiviyê cîranê xwe be.**" ya mezinan tê.
**A**-Karê îro nehêle sibe.
**B**-Rih dibe bost neyar nabe dost.
**C**-Tijîkên maran mar in.
**D**-Her evraziyekê nişiviyeke wî heye.
**4**-Em bûyerên rojane, ji kîjan yên li jêr fêr dibin.
**A**-Kovar **B**- Pirtûk
**C**-Rojname **D**- Şanoyan
**5**-"Dema pirtûkxane şewitî, min dît ku gel ber bi pirtûkxanê ve dibeze." "**ku**" ya di vê hevokê de derbas dibe çi karî dike?
**A**-Dû hevokan bi hev ve girê dide.
**B**-Peyveke bi wate ye.
**C**-Karê cînavekê dike.
**D**-Nîşana pirjimariyê ye.
**6**- Ji jêdera"**çûyîn**"ê kîjan kar li gorî dema bê hatiye kişandin?
**A**-Çû **B**- Diçe
**C**-Wê biçe **D**-Çûyîbû

**7**-Em hinekî rê çûyîn ( ) piştre me dengek bihîst ( ) hûn bi kû de diçin () em hinekî rawestiyan ( ) piştre jî me bersiv da ( )
Di hevokên jor de di nav kevanokan de bi rêzê ve kîjan nîşan tên bikaranîn?
**A-. : ? ;      B- : . , ?      C- , . : ? .   D . ? , : .**
**8**-Em di hewaya **berfîn** de gelek cemidîbûn.
Roja din em **zû** rabûn. **Ew** jî rabû. Di van hevokan de cûrên peyvên ku tarî hatine nivîsandin, bi rêzê ve di kîjan vebijêrkan de hatine diyarkirin?
**A**-Hevalkar, cînav.
**B**-Kar, hevalnav.
**C**-Cînav, kar.
**D**-Pêkir, kar.
**9**-Kîjan ji yên li jêr palvedariya navan e?
**A**-Siyabendê Silîvî
**B**-Dara dirêj
**C**-Hewaya sar
**D**-Zarokê jîr.
**10**-Di kîjan hevokên  jêr de kêmasiya nivîsandinê heye?
**A**-Ez di refê de bûm.
**B**-Ez li dibistanê bûm.
**C**-Mîn nîvîsandîn dîkir.
**D**-Ezmûna min xweş derbas bû.


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Tirkiye
KURDISTAN
Nahcevan
Iran
Suriye
Derya Sipi
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Agri
Bazid
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Behra Wane
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Firat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Besni
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Urmiye
Zaxo
Entap
Riha
Veransehir
Nisebin
Cizir
Nexede
Iskenderun
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Hasakeh
Musil
Hewler
Bokan
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam